

BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELEN KURDISTANÊ LI SWËD

DI DÛ SALEKÊ RE..



NAVEROK

Dî dû salekê re.....	3
Çon egeyne seretayeki bawerêkraw bo edebi kurdi.....	5
Serpêhatiyek ji tora gele kurd	7
Melkemot.....	8
Berpîsayîya karê berhevîrma wêjeya kurdi ya devki.....	10
Qaçaxkerên cigaran.....	12
Hozanê gel Şivan.....	16
Serfîrazi, jari û kêmasiyê Berbangê.....	18
Xaçerê.....	21
Mendalê Mamoste.....	23

O

Berpîsayîr
A. RIZA ALAN

Pergala Rûpelan
A. M. GILLY

Raxistina Nivisaran
SEYRAN Ú GULBAHAR

Redaksiyon

**KEYXUSRO SİPAN-MAHMÜD
LEWENDI-BENGİN BOTANI
ŞORİSGİR ESKERİ-ROZA SEYRAN**

O
BERBANG

Kurdisk tidskrift, utges av Kurdiska Riksförbundet—Ansvarig utgivare och Redaktör: A. Riza Alan—Layout: A. M. Gilly—Sättning: Seyran och Gulbahar.

ADR ESS

Kurdiska Riksförbundet,
Tunnelgatan 14, 3 tr.
111 37 Stockholm/SWEDEN
TEL : 08 / 11 23 42

Prenumeration: Medlemmar
50.- kr/år. Övriga 100.- kr/år.
Postgiro: 64 38 80-8

Xwendevanê Hêja,

Me di hejmarênu buhuri de ji xwendevanen re diyar kinbû ku em dê vê hejmara Berbangê wek hejmareke taybeti biweşinin. Û me bî munasebeta yek saliya Berbangê ji gelek niviskar û senetkaran re nivisand ku bî hilberiyêñ xwe ve besdari hejmara taybeti bibin. Gelek kesan bersiva vê daxwazê dan û nivisaren xwe ji Berbangê re şandin.

Lê, mixabin me ji ber xizaniya abori nukaribû hejmareke taybeti çap bikin. Me vê rewşa Berbangê di vê hejmarê de, bî firehi nivisandiye. Em hêvidar in, dê niviskar û xwendevanê Berbangê vê kêmasiya me têbîgîhêñ û me bibexşinun. Ji ber planê xwe yê li ser hejmara taybeti, me nexwest ku niviskar dirêjayiya hilberiyêñ xwe bî sinor bikin. Lew re ji me hinek nivisaran dî nav du hejmaran de beş kîr û hinekan ji hişt hejmarêne pêş.

Bî hêviya hevkariyeke xurtir, dî sala duwemin a Berbangê de..

Dî Xweşiyê De Bîminin
Le Gel Xoştan

BERBANG

TÊBINI: Dî hejmara Berbangê ya 12. de, dî rûpelê 4. de, bî navê "Erişkariya Leşkerên Türk Lî Ser Axa Kurdistana Iraçê" ve nivisarek hat weşan-din. Ji ber şâsiyeye tekniki navê niviskarê wê ne-hatibû nivisandin. Navê vi niviskari MURAT YILMAZ e. Şâsiya me bibexşinun.

BERBANG

Kovara Kurdi, Xwedi : Fede-rasyona Komelên Kurdistanê li Swêd. Buha : 5 Kron, Abo-na salekê: 50 Kron, 30 DM.

NAVNISAN

Berbang, Tunnelgatan 14, 3 tr.
111 37 Stockholm/ Sweden.
Tel : 08 / 11 23 42
Postgiro : 64 38 80-8

A. Rıza Alam

dı dû salekê re..

Berbang bî vê hejmarê ve derbasi sala xwe ya duwemin bû. Bê guman, dî jiyana weşaneke periyodik de salek, ne demeke gelek dirêj e. Lê ji aliyê Berbangê ve, sala buhuri, dî gelek waran de, bi ders û tecrubê nû ve dagurti ye. Heta iro, ji bo dewlemendi û domdariya kovarê û ji bo xebata redaksiyona wê gelek rê û modeleñ têvel hatine bikaranin. Iro, di

dû xebata salekê re, bî hemû kêmasi û serketinê xwe ve 13 hejmar li ber me ne. Saleki beri niha dema ku ev xebat hate destpêkirin, tu xebateke ku em - ne bî çêyi, ne ji bî xerabi - xwe bisperinê tunebû. Xebata weşandina kovarê ji çaxa damezrandina Federasyonê ve hatibû destpêkirin; lê şertên weşandina wê gelek dereng pijiyan. Lew re, bî ditna me, "domdari" ya kovarê bî serê xwe serketinék e. Ev, ji bo xebata pêş, destpêk û bingehêke pêwist bû. Iro, çewti, kêmasi, qelsi, çi qas pir bin ji; li ber çavan in, xwanê ne û zelal in.

Bê guman, mijûlbûna li ser çêyi û serketinê (ku hebin) Berbangê, para me nakeyin. Lew re, em niha serketina Berbangê bî yi awayi bî sinor dikin û dixwazin li ser kêmasi û jartiyê wê baxêfin. Em hêvidar in dê ev nivisar bikaribe dî xebata kovarê ya pêş de bibe sedemê xwenûkirin û guherineke jindar.

Berbang bî vê rewşa xwe ve, jana çar tiştên bingehin dikêşine. Berbang;

- 1- ji aliyê abori,
- 2- ji aliyê zimançani,
- 3- ji aliyê rojnamevani
- 4- û ji laiyê rêxistini ve krizeke dijwar diji. Ji xwe tiştên ku ji bo hemû weşanê periyodik pêwist in û wan pêktinin ji ne ev her çartış in ?

JI ALIYÊ ABORİ VE

Heta iro Berbangê ji dewletê 15.000 kron alikari girtiye. Ji bo sala 1983 ji bîryarê 31.600 kroni hatiye girtin, lê hin nehatiye stendin. Sermiyanê Berbangê ev e. Mesrefa wê ji, serê hejmarê 6 - 7 hezar e. Yani bî gotneke din, Berbang ji aliyê abori ve li Federasyonê dimije. Lê dema ku Federasyon ji zuwa dibe ? Wê gavê ji, carîna yan 2 - 3 mehan li benda belâvkirinê, yan 2 - 3 mehan li benda çapê, yan ji ku dî çapxanê

de be, çend heftiyan li benda deranînê dimine. Ev giş bî serê me de qewimine. Digel ku me ji destpêka isal ve ji bo bûyer û nûçeyan ciheki giring kiribû programa xwe, ji ber derengmayina kovarê me nûkaribû programa xwe bîcîh binin. Xwendevaneki Berbangê di namekê de dibêje "mîn nûçeyen li ser Newrozê dî meha Heziranê de xwend". Ji aliyê kêmâsiya nûçeyan ve me gelek rexne girtine. Rexne dî cihê xwe de ne, lê rewş ji weha ye. Bê guman wek vê, gelek kêmâsiyê dîn ên kovarê ji bî rewşa abori ve giredayi ne. Dî serê her tiştî re, bê hatineke rûniştî, weşaneke periyodik nikare dûr û dirêj biji. Baş e, gelo sedemê vê rewşa abori, ya kovarê çi ye ? Dewlet, beri ku kovarê Federasyonan bî tevayı finanse bike, dî nav 2 - 3 salên destpêkê de, tenê alikariya belâvkirina (distrubusyon) kovarê dike. (Alikariya ku Berbang niha distine, ev e). Eger kovar bikaribe dî nav van 2 - 3 salan de, isbat bîke ku dikare jiyana xwe bidomine, wê gavê dewlet kovarê, weki kovara endaman (resmi) qebûl dike, destûra mehê 2 hejmaran dîde û wê finanse dike. Hemû Federasyonê bîyaniyan weha destpê kirine. Yani salên pêşin, bî imkanen gelek kêm, lê bî fedakariyêne gelek mezin têñ derbas kîrin. Ji ber ku ev sal, qedera kovarê (heta kerteyekê, ya Federasyonê) tayin dikin.

JI ALIYÊ ZIMANZANI VE

Me ji destpêka weşandina Berbangê ve ji dizanibû ku em (xebatkarê Berbangê) dî warê ziman de gelek kêm in. Me dî vi wari de tu caran bî çavê pîsporan li xwe nenhîrt. Ev yek, dî Berbangê de gelek caran hat diyar kîrin. Lew re, me rastkirina nivisêñ Berbangê tenê dî hînek rewşan de dani ser mulen xwe. Gava ku em li nivisêñ Berbangê bî tevayı mîze bikin, her niviskâ-

reki li gor xwe û bî awayê xwe ziman bi kar tine û dîmîvisine. Me dî dijitiya li ser (î) û (i) de ji tu bîryarekê ne da. Jî ber ku zanina me ya li ser fonetika kurdi têr nake.

Niha Berbang, bî sê zaravêñ kurdi ve, bî gelek devokêñ cihê ve, bî du alfabetan (î, i) ve û bî dehan awayêñ nîvisandînê ve ji-yana xwe dîdomine. Lî heta kengê ? Ev kê şmekê şî û bê serûberiya dî ziman de wê heta kengê bajo ? Em ji destpêkê heta iro, bî hêviya ku wê zimanzanêñ kurd bikarîbin hin rîyêñ muşte-rek vekin û otoriteyekê pêkbinin xebitine. Me digot, bî alikariya munaqşen ku Berbang veke, bî alikariya Federasyonê û rast-rast bi inisiyatîva zimanzanêñ kurd wê zanina dî vi wari de bikaribe li merkezekê bicive û zimanê kovarê dî nav demek ne gelek dîrêj de bîde rûniştandin. Lî mixabin ev weha nebû. Çima nebû, çîma niha nabî, behseke din e û bî rasti ji me ve gelek zelal ni-ne. Lî heta ku xebateke bî vi rengi pêk neyê, em dê ji aliyeke ve kê maniya zimanzanêñ rastin bikşinin û ji aliyeke din ve ji derdê zimanzan û pîsporêñ çayxanan bikşinin. Em bawer in, her kes ji enflasyona pîsporêñ weha haydar e.

Ev problem ji bo kovarêñ ku bî zimanen din tîn weşandin, ji zû ve hel bûne. İro, Tirk, Ereb, Swêdi, Ingiliz û hwd. ji bo weşandina kovar û rojnamen xwe, bî vi awayi hewcedarê pîsporêñ ziman ninin. Lî em hewcedar in ! Hemû weşanen kurdî, hin demeke dîrêj dê hewcedarê van pîsporan bin.

JI ALIYÊ ROJNAMEVANÎ VE

Dî serê her tişti re, karê rojnamevaniyê ji wek hemû kar û senatîn din pîsporiyekê taybeti dixwaze. Tu kes ji me xwendiyê ve

pîsporiyê nine. Ne ji aliye tekni-ka ve meslekê ve, ne ji ji aliye za-nistiya wê ya bîngehin ve..

Bî xwendevan ve çawa pê-wendiyen xurt têñ danin, û hej-mara xwendevan çawa tê zêde kîrin, diyaloga dî nav xwendevan û nîviskarêñ kovarê de çawa tê kûr kîrin û xurt kîrin ? Teknika zimanê nûçeyan, zimanê gotaran, zimanê bûyeran çi ye û çawa tê bikaranin ? Şekil û foto li ku der û bî çi awayi têñ bikaranin ? Ber bî zimaneki sıvik, zelal û hêsa ve çawa gav têñ avêtin ? Dî xebata kovarekê de ev gîş pîrsen bînge-hin in. Û her yek jîvan pîrsan zanin û tecrubêñ taybeti dixwazin. Bê van hêmanen bîngehin rojnamevaniyekê aktiv û nûjen nayê t meşandin. Lî mixabin, tişte ku em dîkin, heta dawi bî amatori û xîşimi têt meşandin.

Beri her tişti, me heta niha nî-karibiye profileki (rûçik) rûniştî bîdin kovarê. Dî rewşa wê ya iroyin de, em ne dîkarin bêjin kova-ra nûçe û bûyeran, ne ji dîkarin bêjin kovara siyasi, çandi, edebî an ilmi. Ji her yekê piçek û ne yek ji.. Ji aliye din ve gelo xwendevanen kovarê ki ne ? Wusa tê xuya kîrin, ku - bî pirani - nîviskarêñ wê ki bin, xwendevan ji ew in.

Eger em rojnamevan bûna hel-bet wê rewş ne weha bûya !..

Dî rewşa iroyin de Berbang, bî nîviskarêñ xwe ve, bî xwendivânen xwe ve, bî zimanê xwe ve û bî naveroka nîvisarêñ xwe ve dî çarçeweyek gelek teng de hatiye bî sinor kîrin. Yan (dî demeke kurt de) ev çarçewe tê nûkîrin û fireh kîrin, yan ji kovar dîbe çend rûpelêñ miri û dîmine.

JI ALIYÊ RÊXISTINI VE

Wek ku tê zanin, Berbang kovara Federasyona Komelêñ

Kurdistanê ye. Federasyon, (wek navê wê ji dibêje) ji komelan pêk hatiye. Lew re, divê piraniya rûpelêñ wê, bî xebata komelan ve û bî nîvisarêñ endaman ve bîn dagirtin. Lî mixabin komelêñ endam dî vi wari de gelek pasif dîminin. Em bî xwe ji, firseta ta-qîb kîrina karûbarêñ hemû komelan nabinin. Û tu raportor û fotografen me ji ninin ku biçim nav komelan. Wek ku me berê ji dî Berbangê de nîvisandibû, diye hemû komele xebatêñ xwe bî xwe rapor bikin û ji Berbangê re bîşin-in.

NETICE

Me li jor rewşa Berbangê û se-demêñ bîngehin ên ve rewşê diyar kîr. Niha ji bî kurti çare:

- 1- Divê temerkuza ku dî warê zimanzen de heye, bêt bikar anin. Bî kê mani, alikariya zimanzanêñ Kurd, yêñ ku li Swêd dijin, bêt stendin.
- 2- Û ev (zanina dî warê zîmîn de) bî rojnamevaniyekê aktiv û modern ve bêt tevgirê dan.
- 3- Ji kovarê re programeke abori bêt çêkîrin. Eger çewtiyek an kê maniyek mezîn ne be, Berbang dî 1984 de alikariya dewletê (ya endamiya resmi) distine.
- 4- Û wê gavê divê bî kê mani du kes bî profesyoneli bixebeitin. Ji ber ku xebata niha gîş "dî ber karêñ din" re û "dî wextêñ vala" de tê meşandin.
- 5- Divê her komele, her endamê Federasyonê rînd tê bigîhêñ, ku heta alikariya dewletê bêt stendin pêwist e em gîş fedakari bîkîn. Ji wextê xwe, bî alikariya aobri, bî belavkirina kovarê û bî amadekirina nûçe û nîvisaran.. Dî dû alikariya dewletê re, bêt gu-man Federasyona me ji, weki hemû Federasyonêñ din, bî qadro-yen profesyonel ve û bêt dijwari-yen mezîn wê kovara xwe biweşine. Heta wê gavê divê em barê wê bî hevdû re hilgirin.

—ÇON EGEYNE— SERETAYEKİ BAWERPÊKIRAW BO EDEBİ KURDİ

I — Dr. Kemal Fuad

Reng e ta êsta em pırsiyare be mëşki gelêkman da hatibê t, reng e gelêkiş hewli eweyan dabêt welamêki becêyi bo bidoznewe. Le waneye lê koline-wey zanisti le encam nizik kirdibê tewe, belam ewey ke hiç gumanî tê da niye, ewe ye ke em pırsiyare ta êsta bê welam mawetewe. Ca le ber girtngiy pırsiyareke w le ber ewey xoşım yekê kîm lewaney ke be duway welamêki becêyi em pırsare da egerê-yin. Hezim kird be witare xuwênerani berêz le birûray xom lem bareyewe agadar bikem û dergayi lê-kolineweş le ser em base bixeme ser pist. Be hiway ewey bibê te seretayek bo gelêk lê koline-wey tir le ser em base. Çunke bê welam danewey em pırsare be şêweyeki rast, nûsinewey mêtjûy edebi kurdi w diyar kirdimi qonaxekani nateyaw emêninewe. Emaneş bêguman dû meseley giring in. Pêwist e bayexêki taybetiyan pê bidrê w be şêweyeki zanisti lêyan bikolirê tewe, ta bigene encamêki rast û bawerpêkiraw ke bitwanin bikeyn be binaxeyeki pitew bo nusinewey mêtjûy edebi Kurd û diyari kirditni qonaxekani her le seretawe ta katî êsta man.

Ca pêş ewey ew seretaye destnişan bikeyn, pêwist e bizanin çi lew bareyewe nusrawe w ew nûsina-ne ta çi radeyek cêgay bawer in û piştîyan pê ebestrê t, ya be watayeki tir pêwist e be duway ew parça edebiyane da bigerêyin ke kıravîn be nimûne bo kontûrin edebi kurdi w le rasti w narastiyân bikolini-newe, ta egeyne ew nimûneyey ke guman le rasti da niye. Ew kate etiwanin be dilniyayiyew seretayeki bawerpêkiraw bo edebi Kurdi destnişan bikeyn û lew şwêneşewe be pêy pêwaneyeki zanisti qonaxekani diyari bikeyn.

Bepêy zanini mîn ewi ta êsta lem bareyewe nus-rabêt û bilawkirbê tewe bepêy koniyan emaney

xwarewan (1):

1- Çend beytêki dildari, giwaye hi şairêki Kurd e ke nawi (Porapoj) e w serdemî jiyani egerê tewe bo 330 P.M. (pêş milad). Bo yekem car le layen xwâlê xoşbû mamosta (Enwer Mai) yew (2) le sali 1960 da bilawkirawetew.

2- Çend beytêk ke basi dagirkurdini Kurdistan eka le seretay bilawbûnewey Islam da, bem pêye ebêt le nawerasti sedey hewtemi miladi da witrabin. Bo yekemcar le govari 'Zari Kîrmancî' da, ke le layen (Seyd Hissen Hîzni Mukîryani) yewe le Rewandîz derekîra, le sali 1930 da bilawkirawetew, nawi xawenekey nabirawé.

3- Dû parça şuri şorışgêri, guwaye hi şairêke nawi (Babe Raxi Hemezani) ye w le katî şorîsekani (Cafer Bin Mehr Bin Hessen El - Kurdi) da diji xelifey Ebbasi (El - Munessim Billah) wîtûyeti, ke le salekani (840 - 841) M. da rûy dawe. Bo yekem car le layen mamosta 'Enwer Mai' yewe le govari (Rnahi. j- 3, Mart û Nisan 1961) da bilawkirawetew.

4- (Marifetü Pirşalyari) bo yekem car çend beytêki le layen (Reşid Yasımı) yewe bilawkirawetew (Kurd û Pêwistegi Tarixi w Nejadê le, L 121, Tehran 1940 ?). Be qisey Hewramiyekan, weku "Reşid Yasımı egêre tewe, 'Marife Tu Pirşalyari le quran Kontur e'".

Emanen ke ta êsta weku nimûne bo kontûrin parça edebi Kurdi nawbiraw in. Esta ba yeke yeke lêyan bikolini-newe w bizanin em qısanî ta çi radeyek cêgay bawer in. Mamosta Enwer Mai, hiç serçaweyek nawnabat bo ew şîraney Kîrdûni be nimûne bo Kontûrin parça edebi Kurdi. Beytekan be zimanêk wîtrawîn, ke zor le zimanî edebi kîrmanciyi jûrûy emrowe nizik e. Emeş pêçewaney desfûr û mêtjûy

gorani hemû zimanêk le cihan da. Hiç zimanêk niye le mawey 2300 sal da goranêki ewto be ser da nehatibê w weku xoy mabê tewe. Nek le mawey wa dûrû dirêj da, belku le mawey çen sed salekiş da goranêki zor ebinin le qalib û şe wey dariştını her zimanêk da. Eger seyri nimûney her zimanêk bîkeyn, ke bo penca ya sed sal pêş êsta bigerêynewe w le gel nimûney heman zimani emro da berawurdi bîkeyn, em ciyawaziye be asani hest pê ekeyn. Be lay minewe em beytane helbestiraw in û serdemî helbestinekeşyan dûr niye. Zor rêy tê eçet ke her le layen mamosta 'Enwer Mai', xoyewe danırabê.

Ew zimananey le sedey çuwaremi pêş Milad da lem nawçeye da bawbûn û zimani nûsin bûn û belgey Bawerpêkirawayan heye zimani 'Fars Bastan', zimani "yuwênani Kon" bûn. Pêş eweş zimani 'Babili' w 'Elami' w paş eweş zimani 'Parsi', ke beşi zoryan le ser berd be tipi mîxi nusrawin û le barey ceng û rûdawekani ew serdemewê bûn (Yuwênani be tipi yuwênaniy ew serdeme w parsi be tipi parsiy enusran). Eger Farsêk ya Yuwênaniyakani emro ke emaney nexuwêndibê w çawi bew nûsinane bikewêt ne ezanêt biyan xuwêne tewe nêleşyan tê egat. Îtir nazanîm çi core tipêk bûn ? !!

Ew beytaneş ke giwaye egerênewe bo seretay bîlawbûnewey Islam, wate ew beytaney ke be 'Hurmîzgan Rûman Atiran Kujran' dest pê eken, be zimanêki têkel û pêkel wîtrawîn ke wêney ew core zimane edebiye le Kurdi da bedi nakirêt. (Zari Kîrmanci) elê: Le hemaney derwêşêk da le Silêmani dozrawinetewe w be tipi Pehlewîk le ser

parçe çermêk nusrawin. Mamosta Reşîd Yasimi le kîtebekey da (Kurd ve pêwistegiyê Nejadê 1w, L 119/120) heman qise dûbare ekatewe, belam kasyan basi ewe naken ew parça çermey em beytaney le ser nusrabûnewe, êsta le kuwê ye w çiy be ser hat ? !

Ew serdemey ewan basi eken (Nawerasti Sedeg Hewtem), em beşey Kurdistan beşêk buwe le imbiratoryeti Sasani ke zimani edebi w ayni w resmiyan Pehlewîk buwe. Em zîmaneş be core tipêk enusra ke her be Pehlewîk naw ebira w le binereta egerêtewe ser tipi Arami hemû ew nusrawaneş ke be tipi Pehlewîk nusrawin û ta êsta dozrawinetewe Kurdi tiya bedi nakirêt û be zori le rûy zimanewê her Pehlewîkin, hendêk beşi Awêstaş be tipi Pehlewîk nusrawnewe. Îtir ne bistirawê ke Kurdi be tipi Pehlewîk nusrabêt ya lew zimane da weku zimanêki edebi be kar hatibêt. Le ber ewe min lew bawere dam ke em: beytaneş weku ewaney pêşû dirust kirawîn û danerekanişî be pêy qisey Mamosta Tofiq Wehbi, Dr. Seid Xani Kurdishani w Hussêن Huzni Mukîryani bûn. (3). Ew dû parça şîreş ke Mamosta Enwer Mai le govari Ronahi da basyan ekat, be pêy qisey xoy ebêt le nawerasti sedey noyem da wîtrabin. Wate ziyatir le 1130 sal pêş êsta, keçi le rûy ziman û şe we w nawerokewe le we eçet ke lem duwayiye da wîtrabin emeş weku wîtrîman pêçewaney destûr û mîjûy gorani ziman e. Sereray ewe, Mamosta Enwer Mai lîreş da hiç serçaweyek destnişan nakat. Belay minewe em şîraneş cêgay guman in û ziyatir be lay ewe da eçim ke Mamosta Enwer Mai xoy helibestibin.

Paşmawe bo hejmari dahatû


(1) - Lîre da mebes le edebi nusrawe nek folklor, ke be hemû şe wekan wîtrawîn û daner û katî danañyan diyar niye.

(2) - Mamostay xwalêxoşbiw 'Enwer Mai' xelki nawçey Badinan bû. Le govare û rojname kurdiyekan da gelêk witar û nûsini heye. Xaweni kîtebi (Elekrad Fi Behdinan. Bexdad 1960) û namilkey (Muhazzere En-Elekrad Fi Elssin. Bexdad 1959) ye. Le sali 1963 da le kori şer da le layen sapay Beissiye xûwênrêjekanawê şehid kira.

(3) - Birwane (İSTİTTLAYI REY) ke le govari (Roji Kurdistan - Şems Kurdistan, 1/3/1973) da bîlaw kirawetewe. Le wê da qsekani mamosta TOFIQ WEHBİ im weku xoy gêrawetewe. Dr. Seid Xan feqeyek buwe (Xelki Meriwan), paşan buwe be Mesîhi w çuve bo Lenden bo xuwêndin, ta buwe be pizîşk emca gerawetewe bo Êran. Xaweni

kîtebi (NIZANI/MIZGANI) ye, ke honıraweye be şe wey Hewrami wîtrawî w biritiye le çend rûnkirdineweyek le barey Aynî Mesîhiyewe. Em kîtebe le sali 1924 da nusrawe w le sali 1931 da bîlawkirawetewe. Em Dr. Seid Xane le sali 1909 da parça çermêki le hewramani ewdiw Êran doziwetewe ke êsta le mûzexaney Beritani le Lenden parêzraw e. Diweki be tip û zimani Parisi w ewi tir be tip û zimani Yonani nusrawe w biritiye le senedêki kîrin û firoştin le nêwan dû kes da, ke yekêkiyan Rezekey be wi tir firoştuwe pênc kesiş le xwarewe boyan imzakirtûn Sali nûsini em senede egerê tewe bo sedey yekemi Miladi. Wate bo ew katey ke parsekan lem nawçeye da fermanrewa bûn. Belam diyar e eme şîtêki tir e. W hiç peywendiyeki be ser ew çerme nezanırawewe niye keguwayne le hemaney derwêşêk da le Silêmani dozrawetew !

SERPÊHATIYEK JI TORA GELÊ KURD



Cigerawîn

Ü ev serpêhatî gelek caran bi stran têne gotin û mixabin, ko navê roj û meh û salan nadê zanîn, û xuyakirin.

Lê tenê navê gernasê serpêhatiyê û eşîra wî û malbata wî û gundêñ wî û carnan jî navê diya wî û xuşka wî û bîrayêñ wî jî têne xuyakirin û yekî ji wan, yan jî çendeka ji wan dikin xwediyêñ stranê.

Her wekû carnan jî navê dijminê wî û eşîra dijminê wî yan leşkerê kîjan dewletê ye didin nişandan. Ü gelek pesnêñ giran û torake bilind di nav strana xwede têñ ber çavêñ me û guhdařen xwe serxweş û gêj dikin û axîn û keseran dikşenin û hin jin jî hene ko digrin û bi rastî ev reng stran gelek dixşewatin û muwêñ mîran gij dikirin.

Em dixwazin çendekan ji wan di kovara xwede Berbangê de belav bikin û li gora destûra xwe ko ti-pa pêşî ji navê gernas çiye em li pey hev dixwazin bi bêjin (A - B - T - S) û di îrode emê dest bi (A) bikin:

Lê divê carêde ezê vê destûra xwe bişkînim û serpêhatiya, (HUSÊYNÊ EHMED) Axakî (ŞİNGALÎ) ji were binivîsim.

Husêynê Ehmed gernasê stranêye û li ser navê keça wî (EYŞANÊ) ew stran hatiye gotin û weke, ko tê xuyakirin dijminê Axê leşkerê dewletê û hin eşîren kurd jî pêre hatine. Axayê navdar ko keça wî avê tie ser û dibêjin:

LO LO HUSEYNO !

Serekê çêdibû li Qêraniya şewitî wa bi dara. Xwedê şes topa têxî mala Eskerê hukûmate, Sê barî eşiran bi ser kozika Huseynê Ehmed, Beranê poşek - mîrê mîra - sermiyanê eşîre, Bavê mi rebena xwedê hatin xwarê.

Mizgîna ne xêrê ji minre hafî dibêjin: Lê lê Eyşanê, rebenê ! Huseynê Ehmed beranê poşek mîrê mîra bavê mi rebenê bi sê gulan brîndare !

Mine digot: Ezê ne ketime heyra kuştina bavê xwe rebenê kuştin kuştina mîra ye.

Lê ezê ketime xema wê xemê, ko piştî kuştina bavê mi rebenê wê sînor fireh bibî li dijmina, li neyara, Huseyno ! De lolo Huseyno, lo bavo !

Şerekê çêdibû li Qîraniya şewitî

Ji dilê mi evdala xwedêre wa li yane.

Xwedê şes topan têxî mala eskerê hukûmate û sê barê eşiran,

Xwe bi ser kozika bavê minde beradane.

Mizgîna ne xêrê ji minre hatî.

Dibêñ: Lê lê Eyşanê por kurê !

Derbekê li bejn û bala Huseynê Ehmed - beranê poşek

Sermiyanê eşîre bavê mi rebena xwedê dane !

Minê digo: Lo lawo ! Ezê neketime heyra kuştina Huseynê Ehmed beranê poşek, mîrê mîra, sermiyanê eşîre, kuştin kuştina mîra ye ! Ez ketime xema wê xemê ko xulamê bavê mi rebenê hemî sêwî sêwlek bin, roja pêşîr tengiyê ji ser bazdane, Huseyno !

Bi rastî mi gelek pesnêñ giran li ser gernasê Kurdistan bihistine, lê (mîrê mîra) di virde hatiye, ko hêjî di cikî dîde me ne dîtiye.

Sermiyanê eşîre, mezinê eşîre ye. Beranê poşek li cem hemî kurdan navdare. Lê (mîrê mîra) gelek bi kêmânî di nav stranêñ kurdî de tê dîtin û ez dikarim bibêjim ko hê nehatiye gotin. Di virde navê gernas Huseynê Ehmed û navê keça wî Eyşanê ye û cihê, ko şer lê bûye Qîrani ye, lê mixabin navê eşîra Axê ne daye xuyakirin, ko mirov bawerdikî, ko eşîra wî jî Qîrani bî ? Ji ber ko Qîrani çawa navê gundekiye, wilo jî navê eşîreke kurdêñ Ezidiye û ez bawer dikim di îrode Şêx Xidir û zarîwêñ xwe mezinê vê eşîre ne.

melkemot

Mahmut Baksi

- Zû kin, apê min gote me. Dem derbaz dibe. Kincen xwe li xwe kin û deren derive !..

Em derketin û çûn pişta xanî. Asîman çik sayî bû. Bi milyonan stêrk keti bûn govendê û diçirisin. Şewqa eletirikên Serê kaniyê xwe dirêjên stêrkan kiri bûn û diçilwilin. Jor û jêr giş bûne hev.

Xalê Temo û çend hevalên wî rextêن xwe girêda bûn û dipeyivin. Me ji hevalên xwe xatir xwest. Hevalên me di nav taritiyê de zû wenda bûn. Çûyina wan dilên me tijî keser kir. Axinfji me çû... Eva serê deh rojane ku em bi hevre bûn. Eskerên Tirkan li me digeriyan. Fermana me rabi bû. Cûnta faşist serên me û ê bavo dixwest. Bavo ji Hepsa Diyarbekrê firar kiri bû û derbazê Binê xefê bûbû. Me bi alikariya hevalên bavo û apê min Bozo xwe gihandi bû gundekê ber hududê.

Piştê çûyina hevalan qedera me keti bû destê qaçaxçıyan. Hevalan nedixwestin ji Kurdistanê dûr kevin. Barê wan giran bû...

Em bi rê ketin. Xwuşka min Bêrivan raza bû. Yekê Qaçaxçi wê xiste nava agaleki û da pişta xwe. Em pênc zarok bûn. Bêrivan du salî bû. Ez keti bûm sala çarda. Em qederek meşîyan. Tarîti wek perdekek reş xwe berda bû ser deşta Heranê. Şev dereng bû. Me berê xwe da bû Pira Selatê. Pira tûj û zirav, wek devê şûrê...

Xalê Temo keti bû pêşî. Wek xortekê çarde sañ dipekiya. Carna xwe davê ta erdê û gohêن xwe mûç dikir. Gohêن Xalê Temo wek radarê dengan digirt. Em li gorya raporêن wî dimeşîyan. Nêzê hidûdê em sekinîn. Xalê Temo bi dengekê nizim ji me re got:

- Têl ji me sed metro dûr in. Du kes ji me ê têlan bibrin û biçin ber bi eskeran ve. Ewê xwe nêzê wan veşerin. Gava esker bi me bihesin, ewê wana

bidin ber tivingan, ku esker nikaribin serêن xwe rakîn û li me bixin.

Xalê Temo qaçaxçıkî navdar bû. Melkemot jî jê ditirsiya. Kezaba wî ji pola bû. Heya îro bi dehan esker kuştî bû. Emrê wî ser çili bû. Hejmara zarakêن xwe nizanî bû. Çar jinêن wî tim bi zaro bûn. İdara wî li ser derbâzkirina mirovan bû.

Piştê peyva Temo me da rê. Li ber têla me qu'luzk da û meşîyan. Em yeko yeko li pey hev rêz bû bûn. Xalê Temo keti bû pêşîya me, apê min li pey me dihat. Li pişt apo, pismemekê Xalê Temo bi sivnikê rêçêن me xira dikir û berepaşkî dihat. Bo ku sibê esker nizanibin ku îşev henek kes derbaz bûne. Nexwe ê serê gundiya biketa belayê. Rêveçûna me baş derbaz dibû. Tîrsa dilê min şikesti bû. Min pozê xwe da bû pozê Heranê û difikirim. Bîna Heranê keti bû pozê min. Deşta Heranê... Deşta bê av, deşta bê dar. Deşta xezebê, a germê, a keljayi. Heran heya îro kê dîbû, kê nedî bû... Heran sitran bû, çirok bû, efsane bû, Heran Nemrûd kiri bû kevir, Xelil İbrahim şewitandi bû, derya çekandî bû. Heran dîrok bû, jiyan bû, mîrxasî bû. Heran xwuşka heft bran bû. Ji hezaran salan vir de pişta xwe da bû heft çiyan û jiyana xwe dom dikir. Heran mar bû, dubîşk bû, moz bû...

Belê, Heran hêvi ye, yar e, dost e. Xwediye soz û qerar e, henûn û dilsoz e. Zû bi zû zarokêن xwe teslim nake, nade dest. Gava pêwis dike. zarokêن xwe têxe zikê xwe û vedşêre. Ji Xelil İbrahim vir de ev tişt bûye namûs, bûye irf û adet jê re. Çaxê quweta wê nagije dijmin, zarokêن xwe teslimê brayêن xwe dike. Brayêن wê çiya ne, şax in, zinar in. Çavêن wan tim ser xwuşka wan e û wê diparêzin. Xwuşka wan doz e, armanc e, welat e...

Ji Nemrûd vir de, dijmin her dem xwestine ku Heranê pîs kin, bê rûmet kin, zarokêن wê bikujin...



Bo vê yekê, Heran iro mayin e, panzer e, qereqol e. Lê dîsa jî dayka me ya hezar saflî dev ji me bernade û me nade dest. Heran xwuşk e, bra ye, evîn e...

Ez bi dengê panzerê veciniqîm. Hişê min tevlehev bû. Heran bû wek marekê reş û di bin min de lepisî... Ji nişka ve çavên panzerê xwuyani kir. Alav ji devê wê dibariya. Perda taritiyê qelişî. Heran şewq da. Em sekînîn. Dawiya me hati bû. Min serê xwe danî ser dilê Heranê û xwe avê te tor û bextê wê. Panzer nêzê me sekini. Em li erdê mîlisin. Dengê eskeran data me. Ez tûcaran ji dengê mirovan hewqas netirsiya bûm. Diranêñ min li hevdû diketin.


Piştê çarikî panzer zivirî û çû. Ger panzer çavên xwe li milê çepê biziviran da yek ji me nedfilişî. Em vêga kuşî bûn.. Lê em vêcarê jî xelas bû bûn. Dengê panzerê keti bû mejiyê min û guminî dikir. Mixê serê min tevlehev bûbû... Em giştî bûn mayina. Me şopa Temo takip dikir. Şaşiyekê piçûk dibû

sedemê mirina me teva. Ji nişka ve xwuşka min Bêrîvan şiyar bû û dest bi girînê kir. Dengê girîna wê çû eskeran. Esker dest bi teqandinê kirin. Fişekîn rengîn wek brûskan dinya ronahi dikirin û serme de difirîyan. Qaçaxçiyen li ber wan keti bûn kozikan bera wan didan û me diparêztin. Zikê Heranê ji fişekan bûbû wek seradê. Toz û telaza Heranê ser me de dibariya. Diya min di nava vi agirî de ji ciyê xwe pekiya. Dadê xwe avê te pişta qaçaxçî û Bêrîvanê jê sitand. Qaçaxçî egalê kiri bû devê wê. Bêrîvan ber fetsandinê bû. Panzer çavên xwe xisti bû zikê Heranê û bûbû Melkemotê me.

Em di bin gulebaranê de derbazê Kurdistan' a Sûriyê bûn. Fişek li ber me, pişt me, nêzê me diketin û dipekiyan. Bi hezaran fişek zikê Heranê tijî berik kiri bû...

Belê, em ev car jî, ji lepêñ Melkemot xelas bûbûn. Belkî jî gunê fişekan bi me hati bû. An jî Melkemot bi fişekîn eskeran can da bû...

HELBESTEK JI ROJEN BARNAS



ŞEYÊ FELEKÊ

Di şeyê felekê de
Gelek hîrî hatin şe kirin.
Hin bisk
Çûn mixabin.
Serşe man,
Dijîn
Lê, hê jî bi pincirandin
Têñ rêstin

Di teşıya
berxwedanî de.
Bihone felek bihone
Kurd
zexm e,
nûjen e,
kon e.

BERPIRSIYARIYA KARÊ BERHEVKIRINA WÊJEYA KURDİ YA DEVKİ

I**M. Eli**

Lı derveyi welat û bı taybeti li Awrûpa, dı warê xebata wêjeya Kurdi de, van salêن dawin gavêن ku têن avêtin yek jê ji ew e, ku wêjeya Kurdiya gelêri ya devki, derbaskırını warê nivisandinê dibe. Bı rasti, beri her tiştî, dîvê mirov bêje ku ev, kareki gelek hêja ye û xizmeta pê şvebirina çanda gelê Kurdîke. Lı hember siyaseta windakîrin û mehandîna ziman û wêjeya Kurdi dibe gaveki berxwedanê.

Wêjeya Kurdiya gelêri ya devki (nenivisandi) gelek dewlemend û xwedan naverokek hêja ye. Lê ji ber ku vê xezina hêja, bı awaki xurt, roki pêştir ji ber geranê mêt tingehkaran û ji ber tavan û babeliskêñ buyer û guherandinê civaki yêñ salan nayê parastin roj bi roj, perçeki ji xwe ber bi ba û leyiyê ve berdide, ji rûmîta kêrhatiya xwe her ku diçe winda dike.

Tedbira xelaskırına wêjeya Kurdi ya devki ji xetera windabûnê, beri her tiştî ew e ku têkeve warê nivisandinê. Gava mirov dide bira xwe, xuya dibe ku tişteki gelek hindik ji wêjeya me ya devki berhev buye û ketiye warê nivisandinê. Ji ber ku bî kûr û firehi tu agahdariya min li ser berhevkîrin û nivisandina wêjeya Kurdi ya gelêri ya bî zaravayê Sorani nine, nikarîm bêjim ka gelo wêjeya me ya gelêri ya dî vi zaravayı de hemi berhev bûye, yan na. Lê dî zaravayê Kurmanci û zazaki de, qasi ku haya min jê heye, gelek kêm tişt hatine berhev kîrin û nivisandin.

Destpêkirina berhevkîrin û nivisandina wêjeya me ya devki ji demek gelek berê de ye. Bî texmina min cara pêşin, ev kar dî dawiya sedsala nozdan de ji bal gerok û misyonerên bîyani ve hatiye destpêkirin. Lê tiştênu ku wan berhevkîrine, ji du -

sê pirtûkan zê detir ninin. Dû re dî destpêka sedsala bistan de, ronakbir û welatparêzêñ Kurdistan ên ku bî zmanê Kurdi kovar û rojname weşandine, wan ji hin ji çirok û stranêñ dî nava gel de berhevkîrme û dî kovaren xwe de çap kîrine. "Hewar" minakeki hêja ye, dî xizmeta vi kari de. Ger ez ne şaş bim ez dibêjim qey, pirtirin xebata dî vi wari de ji bal Kurdêñ Yekitiya Sovyetan ve hatiye kîrin. Her weki Ordixan, Celil û Cemila Celil pir zehmeti xwarine û gelek stran, çirok, tiştanek, gotinêñ pêşîya û her weki dîn berhev kîrine, çap kîrine û wan ji windabûnê xelaskîrine. Lı Yekitiya Sovyetan hin berevokêñ hêja çap bûne.

Lı Kurdistanâ Tîrkiyê, dî wan salêñ beri inqilaba leşkeri, ya 12' ê İlona 1980' yi de, dema dî bîn dara zordestiyê û bî gelek kul û kîmasîyan hin kovar û rojnamêñ Kurdi çap dibûn, car carîna vê xebata han ji dî nava rûpelên wan de dihat xuyakîrin. Ji wêjeya me ya devki çend çirok û stran dî wan kovar û rojnaman de ji derdiketin. Jê pêştir, xebata dî vi wari de heta niha tê kîrin bî rasti ji bal hin niviskar û dilsozêñ ku li Awrûpa dijin, tê kîrin.

Dîvê karê li ser berhevkîrin û nivisandina wêjeya Kurdi ya devki, bî awaki xurttîr û rêk û pêktir bê domandin. Lewre, her weki me li jor ji got; tiştî berhevkîri, dîve ku nagihêje ji çaran yekê neberhevkîri. U her wîsa xuya dike ku, dî pêvajoya iroyin de, ji ber hoyen dijwar, yê winda dîbe û ji kêrhati û rûmîta xwe kêm dike ji, hema hema dighê yê berhevkîri.

Lê gava em bîn ser vê niqtê, diyare ku karê berhevkîrin û nivisandina wêjeya me ya devki ne kareki hêja ye. Beri her tiştî jê re zanebûn dîvê. Pişt re,

sebr û taqetek dûr û dirêj ji hebe. Zanebûn bî serê xwe têrê nake.

Çima beri her tiştî zanebûn ? Wêjeya Kurdi ya devki, perçeki ji jiyana civaka me ya manewi ye û fêkiyê peywendi û jiyana abori û civaki ye, ku ev peymendi û jyan dî pêvajoya diroka salan de avabûne. Peywendiyêن abori û civaki yêñ her demê li gora xwe jiyanek manevi afirandine, bî serûber kîrinê, ku wêjeya me ya devki ji bî xwe di beroşa vê jyanê û dî bin agirê van pêywendiyân de keliya-ye. Ev peywendi û jyan çewa, ne xwezû û yekaline, her wisa wêje ji li gor rengê wan pejiriye. Jiyana eşirtiyê, koçeriya bî hezar salan ve cotkari û peywendiyêن pir aliyêñ derebegi êriş û istilayêñ ordi-yeñ bîyanîyan, kîrdayeti û mîn tingehkariya dewle-têñ xwinmêj ên bîyanî, talanêñ wan, dek û dolabêñ wan, perçekirina welat, şerê eşir û derebegi-yeñ Kurdan bî xwe, jiyana Kurda û a ciranêñ wan ku dem bî dem bî şai û kêfxweşî derbasbuye, dem bî dem ji şer û cengê xwin li nava wan rêtîye... u her weki din, her weki din... Pişt re jiyana civaka Kurda bî xwezayê (tebiet) re, berxwedanêñ wan ên bê dawi li hember buyer û hoyêñ dijwar yêñ xwezayê... Van buyerana hemiyan çi dî destpêka hilatin an avabuna xwe de çi ji dî dawiya imrê xwe an dî wînda bûna xwe de naverok, reng û teşe dane wêjeya devki ya Kurdi. Wêjeya Kurdi ya devki dî bin tesira wan de, ji bal serpêhatî û heçandinê van buyeran ve hatiye avakîrin. Lo ma bî gelek grêbendîya me grêdayî bî vê jyan û peywendiyêñ abori û civaki ve ye. Wek wan kanikê wê serpêhatî û dirokeke wê heye. Jiyanek wê ya "gani" heye. Zaye, geş buye û ketiye payiz û duvre zivistana imrê xwe.

Keseki ku dixwaze, wêjeya Kurdi ya devki, berhev bike binivise û bixwaze wê têxe jiyana bê mirin, dîvê bî kêmasi hay li van tiştan hebe. Derheq van peywendi û buyeran, grêbendîya wêjeyê bî van re, tesira jiyana abori û civaki li ser wê, agahdarike wi an wê hebe, piştîre hayle, rê û teşeyêñ berhevki-rina wêjeya devki hebe. Ger ev zanebûn bî kesê ku dixwaze wêjeya Kurdi ya nemivisandi berhevke re tunebe wê gavê ew nizane û nikare vê miras û dewlemendîya hanê bî orijinalita wê û a giring bî kêrhatuya wê derxe meydanê, pêşkêşî jiyana wêjeya Kurdi bike. Ger tiştê ku derdikeve meydanê, ew ne bî orijinalita xwe be û naveroka wê ji kêrhati-yêñ wê valakiribe ew nikare bibe himê wêjeya ku emê li ser ava bikin. A xetertir berevokek nemivisandi, gava ne bî orijinalita xwe û ji kêrhatiya nave-roka xwe bêpar têkeve nivisandinê, wê gavê ew pirtir rê li ber orijinala nemivisandi digre û nahêle ku ew xwe ji babelîsku leyiyêñ buyeren civaki xelas ke.

Vê yekê, her wiha dide xuyakîrin, ku çîma kesê wêjeya Kurdi ya gelêri devki berhev dike, dîvê xwedan sebr û taqetek dûr û dirêj be. Ger bî sebr û taqetek dûr û dirêj û xurt nebe, wêjeya Kurdi, ku dî bin tesira wan -buyeren me li jor xwest bijmêrin-de pêkhatiye û niha di bin hoyêñ gelek dijwar de ye, nayê derxîstîn. Nabe himê wêjeya nivisandi, xizmeta pê şde birîna wêjeyê nikare bike.

Em hemi pê dizanîm. Wêjeya devki, ber ku nemivisandiye, zu diuguhere û gelek cudati û perçebûn tê de çêdîbin. Ew ne dî rupelên pirtûka, lê dî devê stranbêj, çirokbêj û dapir û bapiran de jiyana xwe didomine. Jî deveki derbasi deveki; bî vê riyê ji herêmeki derbazi herêmeki din dibe. Stranbêj an çirokbêj hene gava distirêñ an çirokan dibêjin himendiki gelek hêja dî dev û dengêñ wan de heye, ne ku li dibistan û akedemîyan lê dî jiyana rojane ya têvil de xwe gihadine. Xwedan serbori û hêçandiyêñ jiyani ne. Rumeta stran an çirokêñ xwe dizanîm, wan wek çavêñ xwe diparêzin. Hin stranbêj û çirokbej ji hene evê ji dengbêjîyê ji çirokbêjîyê hiz dikin û carnâncı dîbêjin ji lê hinermendi û zanine-ke bes li ser wan nine. Ew ji dîbêjin lê hay ji paras-tina çirok û stranan ninin. Ku ji bir bikin ji ber xwe ve lê zêde dikin an orijinalita çirok û stranan xera-dikin. Nav û buyeren axayê xwe hîzkiriyêñ xwe an herêma xwe dixin nava van stranan an çirokan. Carnâncı buyeren salan guherandina edet û exlaq ji stran û çirokan diuguherin, stranek an çirokek; mirov dîbîne ku dî her demê an dî her herêmêde wek hev nehatiye gotin. Gelek çirok, stran an destan he-ne ku reng û naveroka xwe ya nuhavabûnê wînda kîrine û a niha ji dî her herêmekê de bî awaki din têñ gotin an têñ stran.

Yeki ku dixwaze stran, çirok an destanek devki têxe warê nivisandinê, pêwisti li sere, ku heta jê tê li gelek herêman bigere, ji gelek dengbêj û çirokbêjan bibihize û cudatiyêñ ku hene wan tespit bike û wan binivise pêşkêşî zmanzan, folklorzan û niviskaran bike. U her wiha bide xuyakîrin, ka ji kijan herêmê û ji devê kê girtiye. Neku hema tiştîki ji herêma xwe an stranbêjeki bîhist rabe bêje orijinalê vê stran an vê çirokê eve e, û dîvê bî vi awayi têkeve warê nivisandinê. Dema mirov bî vê şêlê re rabe, bî rasti carnâncı dîtin ku dema dîkeve warê nivisandinê gelek xaxêñ giran têñ serêñ hin çirok û stranêñ me. Hela gava, ev kar ne li hundîre welat dî nava gel de, lê li Awrupa têkirin xeteriyêñ mezin hin pirtir xwe pêş de dikin. Bî izna we dixwazîm çend minakan dî vi wari de pêşkêşî çavê we bikim:

QAÇAXKERÊN

CIGARAN

Firat Ceviri

Bozan bange banga wî bû bang dikir li qada Konakê:

— Marlboro, kent... marlboro... kent... marlboro...

Polisen sıflı dora wî girtin. Ne yek, ne du, se dolmış tije polis, giş polisên sıflı û ji şuba duwemîn bûn. Gava ku Bozan çav li wan ket, bazda û kete nav qerebalixê. Ji wî tirê, ku xelas bû. Lê hew nihêri, ku destek li nav milê wî ket.

— Tu ê bazde, ha !.. De bazde. Çima tu baznade, bêjî lawê bêjiya ? Ev çend carin, ku em dibêjin, "Li vir cigaran mefroşin". We ev Izmirâ weke gulekê kire gû. We gû xiste nav vî bajare weke zêr û bi milê wî girt bir cem dolmişê.

Di hundire dolmişê de sê nefer polis hebûn. Hersê jî navsere û rûtîş bûn. Ew polisana bekçiyê zarokên bîhata girtin bûn. Polisê ku Bozan girtibû

pehînek lê xist, avête hundire dolmişê û ji yên ku di hundire dolmişê de bûn re got:

— Ha ji we re, em ê hemûwan bigirin. Em ê koka wan biqelînin. Dû re paş de vegeriya.

Yekî ji nav wan polisan kulmek di çenga Bozan da lêxist û got:

— Hey bêjî, ma hûn nizanîn, ku cigarefirotin qedexe ye ? Ma hun nizanîn, ku qaçaxkeriya cigaran qedexe ye, qedexe ? ..

Dû re bi guhê wî girt, diranên xwe qırıçand û got:

— Hela tu dersek baş li qereqolê bistîne, hingî dê hisê te bê serê te. Hingî tu ê fehm bike, bê ev gûxwarînî qedexe ye, an na ?

Bozan hîn zarok bû. Du meh mabû ku yanzdehan dagire. Wî polisê ku di çenga wî de lêxist, belkî bayê zarokekî

wisan bû. Dibû ku zarokek wî jî di emrê Bozan de hebû. Lê wer xuya bû ku ji zarokên xwe pê de ji zarokên tu kesî din hez nedikir. Nizanî bû, bê zarokhezkirin ci ye ?

Bi wê kulma wî, di nav diranê Bozan de xwîn pijiqî. Xwîna ku ji devê wî hat li ser qoltixên dolmişê belav bû.

Polis yeka din jî di çenga wî de lêxist û bi ser de qırıya:

— Xwînê daqurîfine, xweziya xwe daqurîfine, bêjî ! Tif meke ser qoltixan...

Xwîn daqurtandin, xwezi daqurtandin, di wê demê de ne tiştek bû li ber Bozan. Hisê wî li hersê paket cigaren wî bû. Hersê paket jî, ji cigarefirosê wê taxê dehyn kiri bû. Li her taxekê serokekî cigarefirosan hebû. Vî serokî bi deyn cigare difrote zarokên cigarefiros. Gava ku zarokan di hundire rojekê de perê wan li wan venegeranda, cihê wan li wê taxê nedima. Wan hew karî bûn cigare li wê taxê bifrotana.

Tirsa wî ya herî mezîn razana girtîgehê bû. Ji ber ku apê wî Keleş deh salan di girtigehê de razabû. Pişti ku hatibû berdan ji wan re û ji temama nas û dostan re rezîlî û perîşaniya girtîgehan gotibû. Û gotibû, "Heta ku ji we bê xwe ji girtîgehan biparêzin".

Bozan ji tîrsan dilerizi, xwe negirt û qırıya. Paşê li ber wan geriya ji bo ku wî berdin. İcar polisê ku di pêşiyê de rûniştibû, xwe di ser qoltixan de dirêj kir, destê xwe bi hêz li ser çavên wî xist û got:

— Hişş, bêjî... Ker lawê keran. Lawê qahpê digirf jî...

Hîn polis peyva xwe dom dikir, ditin ku yekî din jî bi kulm û pehînan kete hundire dolmişê. Polisê ku lawik avête hundir, ji polisên di hundire dolmişê re got:

— Me iro ev girtin. Lê em ê koka wan biqelînin. Hela em dersek baş li polisxane bidin van, de hingî tebigîhê, ku firotina cigaran qedexe ye. Dê hingî hisê wan baş bê serên wan.

Polis şofêr ji yên din pîrsî:

— Em van bibin kîjan polisxanê ?

Ji dawiya dolmişê polisekî bi rih û rûtîş:

— Bajo, em ê van bibin polisxana Fuarê !

Ji xwe tirsa hemû zarokan jî polisxana Fuarê bû. Komserekî polisxana Fuarê hebû, zarokan navê wî kiribûn



"Xwediye darê bê Xweda". Berî ku li zarakan xista, pêşî navê darê xwe ji wan dipirsi, yêñ ku navê darê wî nizanîba deh dar zêde li wan dixist. Hersê dolmîş ji qada Konakê derketin. Du heba ji wan berê xwe dane Mezarlikbaşî û ya ku zarok tê de jî berê xwe da polîsxana Fuarê. Pişti ku dolmîş ji meydana Konakê derket, polîse ku li nik Bozan û Misto rûniştibû, bi guhêñ wan girt, serêñ wan li hev xist û bi hêrs got:

— Hey bêjiyên heram, ma em ê hertin bi we dakevin. Ma hun nizanîn, ku ci-garêñ biyanî qedexe ne ? ..

Polise şofêr peyva wî birî û ji zarakan pîrsî:

— Hun ji ku ne ?

Herduwan bi hev re bersiv dan.

— Em ji Mêrdîn in.

— Hun ji hundirê Merdînê ne an ji qezayen wê ne ?

Pêşî Bozan bersiv da:

— Ez ji Dêrikê me.

Dû re Misto:

— Ez ji ji Nizêbinê me.

Polise ku li dawiyê rûniştibû, bi dengekî bilind got:

— Yaho min fehm nekir ! Cigarefiroş ji Mêrdîn. Qaçaxker ji Mêrdîn. Meywefiroş ji Mêrdîn. Mêrkuj ji Mêrdîn. Ev ci ye yaho ? ..

Polise ku li nik şofêr rûniştibû got:

— Çima dê ne ji Mêrdîn bin ? Ev li malle belaş digerin. Ev tu karekî weke mirrovan nakin. Ev bêbab in, bêbab... Li paş xwe zîvirî serê herdu zarakan li hev xist, diranêñ xwe qiriçand û got:

— Hey lawê keran, bes e ji derdêñ we. Ma em ê ta bi kengî li dû we bin ?

Polise şofêr pişti ku ji zîvironekê zîvirî seriya rast got:

— Hun ji kijan siyasete ne ?

Bozan mile xwe hejand û got:

— Yê min ez ne ji tu siyaseta me.

Misto ji eyñ weke wî:

— Yê min ez ji ne ji tu siyaseta me.

Polise ku li dawiyê rûniştibû, ji paşiyê de herkê hutikek li paş stuyê wan de lêxist û got:

— Derewa mekin. Hun çawa ne ji tu siyasetan in.

Bozan:

— Welleh ez tu siyaset miyasetan nasnakim.

Misto ji weke wî got:

— Welleh ez ji tu siyaset miyasetan nasnakim.

Hema ku Bozan ci bigota, Misto ji ew digot. Ji ber ku Bozan bi salekê tiştekî wisa ji Misto meztir bû. Carna gava ku polisan ji wan nuqurç vedidan, Misto xwe nedigirt û digiriya. Lê Bozan nedigiriya, tenê ruyê wî sor diwu û bêdeng dima.

Edî mînubus ji polîsxana Fuarê derbas bû. Armanca polisan ew bû, ku hin

zarokên din jî bigirin û roja xwe bibin sêri. Lê ji Bozan û Misto tirê, ku dê ew bêne berdan. Ji Bozan bêtir këfa Misto dihat. Tev paketên ku di destêñ wî de hatibûn girtin, deh paket cigare çedîbûn. Lê her şesê din di ber goreñ xwe de veşartibû. Wisa këfa Misto hat, ku xwe negirt û spasen xwe ji wan re got:

— Pir spas ! Welleh ez carek din cigaran naftosim. Ez ê di çayxana xalê xwe de şagirtiyê bikim.

Polise ku li nik wî rûniştibû, di devê wide lêxist û got:

— Hiş be, bêjiyê heram ! Tu ê içar me bixapîni ha ! ..

Misto disa pozê xwe daliqand û kire îskin.

Edî dolmîşa wan gihişte Tepecik û ajotin ber devê hewşa kerxanê. Mirov ax biavêta li erdê nediket. Li ber devê hewşa kerxanê her tişt dihate firotin. Lê yen ku cigare difrotin, diva bû ku çar çavêñ wan hebuya. Tîrsa wan ji yêñ din bêtir bûn. Her kesi jî nikarî bû li ber devê hewşa kerxanê cigare bifirota. Yêñ ku li wir cigare difrot, diva bû ku dilê wan kevir tê de buya. Ji ber ku bîst û çar saetan polis li wir pêde dibûn. Ji xwe li wir ji sê cigarefiroşan pê de cigarefiroş tunebûn. An kesi newêri bû li wir cigare bifirosta. Ku ne ji Çeto buya kesi li wê taxê cigare nedifiroş. Edî taxa Tepecik ketibû destêñ Çeto. Bi kurtî Çeto bûbû serokê cigarefiroşan li wê taxê. Yanî navê taxa Tepecik bûbû taxa Çeto. Çeto ji berê li Konakê cigare difrot. Pişti ku wî û serokê cigarefiroş Konakê li hev nekir. Edî serokê cigarefiroşan nehiş, ku ew li wir cigaran bifiroşe. Wî jî edî li wir cigare nedifiroş. Pêşî çû nik serokê cigarefiroş Bornova li wir jî li hev nekirin. Du re çû Alsancak, pişti ku li wir jî li hev nekirin, edî çû taxa Tepecik û ji xwe re çend cigarefiroş ji pêde kir û bû serokê cigarefiroşan. Ew tax, bû taxa wî. Ji temama serokê cigarefiroşan bêtir ji ew dihate naskirin. Dost û hevalên wî ji yêñ temama bêtir hebûn. Hema hemma polisen sê polîsxanan ew nas dikirin. Tenê peywendiyêñ wî bi polisen Fuarê re tunebû. Gava ku peywendiyê xwe bi polisen Fuarê re ji çebikira, tirssa wî nedima. Polisen din ku dihatin, digotin:

— Çeto !

Çeto ji digot:

— Temam, temam ! Me fehm kir. Bi di-zî paketeck cigare dixiste bêrîka wan û ji ser xwe der dikirin. Carna ji destê xwe dikir hutik, li zikê wan dixist û digot:

— Hun wek gurêñ birçî ne.

Ji xwe temama cigarefiroşan navê polisan kiribsin "Gurêñ birçî".

Gava ku polis ji dolmîşê daketic, Çeto fikand û ji hevalê xwe re got:

— Xwe bidin alî, gurêñ birçî hatin. Şika mirov tew ji Çeto çênedibû. Ew tu caran ji nebatibû girtin. Derbeke kîrî bihata girtin, ew ji súcê hevalê wî bû.

Çeto disa fikand. Lê hevalê wî lê hayî nebû. Her ban dikir.

— Marlboro, kent... Marlboro... Kent... Marlboroooo...

Polisek ji wan çû bi qestî cuzdana xwe derxist û bazara cigaran kir:

— Kent bi çiqasî ye ?

— Liba wan bi sî lîreyî ye, tu li Konake bi pêncî bi dest naxînî.

Polis hûn bêtir xwe li nezaniyê danî û got: — Na, ez ê bîst û pênc lîran bidim te. Ez cigaren weki din venaxum. De, bîst û pêncan bide min !

— Na apo, çênabe ! Ji te tirê ku ev samsûn e ?

Polis du lire û nîvên din jî lê zêde kir. Ji xwe nîta wî û kirînê tunebû. Armanca wî bîskê lîwik bixapîne.

— Niha tu bi bîst û heft û nîvan jî nadî ?

— Bîst û heft û nîv kirîna wan e, apo ! Serê paketê em du lire û nîvan kar dîkin. Çavêñ te lê ye em bê kar bidin û li vir li ser lingan birikrikin. Ji xwe tîrsa polisan ne tê de.

Çeto li hember wî rawestyabû û jê re bi destan işaret dikir. Lê lîwik qet li dora xwe nedînihêri, wî her bazara cigare dikir.

Polis disa got:

— Birazî, bi bîst û heft û nîva bide min, ne hewcî ku ez ewareyî Bornova bîbim. Ku ez herim Bornova li wir paketê kent bi bîst û pênc lîran e.

Lîwik berê xwe jê guhert û got:

— Baş e apo, her ji xwe re ji wir bikire. Polis heta ku jê hat şîmaqê lê xist, bi mile wî girt û got:

— Bide pêsiya min, bêjiyê heram... Hingî lîwik fehm kir, ku polis e. Pêşî xwest ku bazde, lê kir nekir firset neketê.

Paketeke marlboro û du paketên kent di destan de bû. Çeto hêdî di ber wan de çû, dada pekêtê di destê lîwik de û bazda. Polis bera dû wî da. Lîne polisek, deh polisan bi hev re ji ber dû Çeto dan zept nedikirin. Gava ku polis bera dû Çeto da lîwik kuçe li xwe zîvirand û winda bû. Ji xwe sê polis daketibûn, ji bo ku zarakan bigirin. Pişti wextekî kurt, hersê ji destvala ber bi dolmîşê vegeriyan. Gava ku ketin dolmîş, yekî ji wan destê xwe li ser çavêñ Bozan û Misto xist û got:

— Hun ê bazdin ji ha ! .. Hun ê me bixapînin...

Dolmîş ajotin. Gava ku gihaştin zîvironeka Basmanenê Misto disa li ber wan geriya ji bo ku wî berdin. Polisekî ku li paş wî rûniştibû, bi qemçika paş stuyê wû girt bi hêz hejand û got:

— Em ê te berdin ha ! .. Bêjiyê, bêji... polise ku li kèleka wan rûniştibû, çeka

di destê xwe de nişanî wan da û got:

— Ger ku hun navê vê çeka di destê min de zanibin emê we berdin.

Bozan û Misto bi hev re lê nihêrin. Gelo dê navê wê çi bûya ? Wer ku li wêlêt qala tifingên Almanî dibû, ji Misto ku tifinga Almanî ye. Lê Bozan pê keniya û got:

— Ma ev ji ku tifinga Almanî ye, mal-wêran ! Ev keleşnikof e.

Hingî temama polisan li çavên hevdû nihêrin. Yekî ji wan dîsa jê pîrsî:

— Te got, navê vê çi ye ? ..

Bozan milén xwe hejand:

— Ez baş nizanim. Lê ez texmîn dikim, ku ev keleşnikof e.

Polisê ku li heri dawiyê rûniştibû, bi dengekî gur got:

— min ji we re negot, ku ev bi her tişti zanin. Ev Kurd in. Gava ku mirov bibêje "Kurd" divê ku mirov pênc deqîqan bihizire...

Yê şofêr peyva wî domand.

— Welleh rast e, her tişt ji van tê. Ji mîrkujiyê bigire ta bi qaçaxkeriyê.

Edî gihiştin ber devê polisxanê, dol-mış dane sekinandin, her du heban bi milê yekî girtin û ji dolmîse daketin. Gava ku ketin hundirê polisxanê, kom-serê ku li ser masê runiştibû got:

— Baş li van bigerin û bavêjin nezaretê. Hingî ji tırsan çokên Misto lerizîn, xwe negirt û giriya. Gava ku polis li wan ge-riyan şes paket cigaren din jî di ber gorêni Misto de ditin. Teva paketên ku di destê wî de hatibû girtin tam deh pa-kêt cigare çedibû. Pişti ku polisan her yekî deh dar li wan xistin, paşê avêtin nezaretê. Ji Bozan bêtir Misto digiriya. Gava ku bi serê xwe di nezaretê de man, Bozan şîret lêkir û ew da rawestan. Dû re destê xwe nişanî hev dan. Kefa destê herduyan jî reş û şîn bû-bû. Dîsan ji Bozan bêtir janê dida dilê Misto. Qet nikarî bû li ser lingan rawestiya. Daqûl bû û li ser tutikan rûnişt. Paşê herdu destê xwe dane ser hev, xiste nav çokên xwe û guvaş. Dikir nedikir tebatî nediketê. Wisa janê dida dilê wî, ku nikarî bû di cihê xwe de rawestiya. Pişti ku hebki jana dilê wî temirî, rabû ser xwe eyn weke girtiyen girtigehan du- sê caran di hundirê ne-zaretê de çû û hat. Dû re devê xwe xis-te guhê Bozan û got:

— Tu bi a min bikî em ê bazzin.

Bozan destê xwe li singa wî xist û got:

— De here kuro ! Em ê çawa ji destê van polisan bazzin ? Ma te navê kom-serê Fûarê nebilîstiyê, bê çi bêbav e.

— Ez di bebaviya wî nim. Ew bêbav be, ez jê bebavtgir im, oxlum !

Bozan xwe avet sînga wî, ziq li çavên wî niheri û got:

— Devê xwe temiz bigire. Carekê din nebœye "Oxlum".

Misto destê Bozan ji sînga xwe daxist û

got:

— Binêr, welleh ez rast dibêjim, ger ku tu bi a min bike em ê bazzin.

Bozan serê xwe kil kir,

— Zor e, zor...

— Çi zor e, looo... Apê min panzdeh sal ceze lê hatibû birin, bazda. È te tu dibêje zor e.

Bozan destê xwe da ser devê wî û bi pistîn got:

— Hişbe lawo, qala tiştên wisa meke. Dibe ku mikrofon li van deran hebe, dê dengen me bê girtin, hingî em ê di girtigehan de birizin.

Misto destê xwe ber bi wî ve hejand û got:

— Here lo, tu biziya. Çi mikrofon û ci hal. Ma mikrofon hebe dê di ku dê be. Ma ne tenê ev hundir e ?

— Belê, tenê ev hundir e. Lê ew karin cihê mikrofonê di dîwê de çebikin.

Edî, hêdî hêdî tarî dikete erdê. Her ku ji der ve tarî dibû, hundir nezaretê hîn bêtir tarî dibû. Bozan û Misto edî di hundir de aciz bûbûn. Dev ji acizbû-nê berde, ji birçina nikaribûn li ser xwe rawestana. Geh xwe li erdê dirêj dikirin, geh di hundir de diçû û dihatin. Ji xwe nezaretxane tenê cihê sê peyan tê de hebû. Lê di hundir de tu tişt tunebû. Textikek jî tunebû ku xwe bidana ser. Li ser çimento bûbûn we-ke daran. Her ku dereng dibû, hîn bêtir hundirê nezaretê dicemidî. Baş bû ku Misto çakêtê wî lê bû. An na dê ji serma biçefiliya. Bozan jî tim sola xwe dixiste bin ser xwe û xwe li ser çimento dirêj dikir. Misto çend caran li derî xistibû, ji bo ku here tuzaletê. Lê polis pê re xeyidibûn û derî lê venekiribûn. Misto hew xwe girt. Li derî xist nexist, tu kesî derî lê venekir. Hema qonçen şalwarê xwe vekir û di qunci-kekê nezaretê de mîst. Gava ku xwiş-na mîza wî hat, Bozan ji cihê xwe peki-yâ û bi ser de qiriya:

— Lawo, lawo, ma tu çi dikî ? Em ê çawa di vir de bîmînin ji bêhna mîza te. Em ê çawa di vir de razen işev ? Misto fedî kir, tu bersiv neda.

Dengen ken û henekên polisan di hundir polisxanê de olan dida. Wer xuya bû, ku edî dor dihate guhertin. Ji devila polisên ku bi ro xebîlî bûn, edî polisên şevê dihatin. Di wê nîvê de yek ji wan polisên ku nu hat, çû ber derê nezaretê û pîrsî:

— Sûcê we çi ye, kuro ?

— Cigare bi me re hatiye girtin.

Polis destê xwe di nav şîşen derî de dirêjî serê herduwan kir, serê wan li hev xist, diranên xwe qiriçand û got:

— Cigare bi we re hatiye girtin, ha ! ... Tew cigarên biyanî ?

Pişti ku ew polis çû, yekî din hat. Çar-pênc nifte di destê wî de bû û hate ber

derî. Beri ku ew bipirse, Bozan got:

— Sûcê me cigarefirotin e.

Ji ber ku zêdeyî deh polisan ji wan pîr-sî bûn. Gava ku digotin "Sûcê me cigarefirotin e" polis bi ser wan de radi-bûn, xeber û gotinê pîs ji wan re diki-rin. Carna ji bi guhê wan digirtin û se-re wan li hev dixistin.

Misto jî rabû,

— Sûcê me cigarefirotin e.

Polis wa bi dilşewatî serê xwe hejand û got:

— Ez zanim, ez zanim ! Ez zanim hun qaçaxkerên cigaran in. Ez zanim, ku hun bi tirê û këştiyan qaçaxkeriya ci-garan dikin...

Misto peyva wî birî:

— Na welleh ne em in. Em bi tirê û këştiyan, qaçaxkeriya cigaran nakin.

Bozan niçurç jê veda û got:

— Bêaçilo, ew heneka dike.

Polis keniya, serê xwe hejand û ji wan pîrsî:

— Hün dixwazin herin tuwalet muwa-lete ?

Herduwa bi hev re gotin:

— Em çawa naxwazin herin tuwaletê ? Polis ji wan re derî vekir. Gava ku derî vekî, herduwan bi hevre bazzan tuwaletê. Pişti ku ji tuzaletê vegeriyan, polis ji wan pîrsî:

— Hun ne birçî ne ? Ma we tu xwarin marin xwariye an na ? Dîsa herduwa bi hev re gotin:

— Na...

Polis çû ji wan re nanekî firnê ê mezin û hin zeytûn û helaw kirî û anî da wan. Herduwa wek du gurên birçî nan ji destê hev revandin. Pişti ku zikên xwe dagirtin, polis dîsa ji wan re derî vekir. Çûn têr av vexwarin, dest û çavên xwe şuştin û vegeriyan cihê xwe. Gava ku polis derî li ser wan girt, ji wan pîrsî:

— Min nepîrsî, gelo hun ji ku ne ?

Pêşî Bozan bersiv da:

— Ez ji Dêrike me.

Dû re Misto got:

— Ez jî ji Nişbînê me.

Polis jî, xwe bi wan naskirin da:

— Ez jî ji Wanê me.

Di wê nîvê de herdu hevqas kêfxwes bûn, ku nizanibûn di nezaretê de ne. Gelo ji bo çi ew polis evqasî ji wan re baş bû ? Gava ku polisên din dihatin, tenê ji wan re xeber didan û serê wan li hev dixistin.

Polis dîsa ji wan pîrsî:

— Dê û bavê we li vir e an na ?

Bozan:

— Na !

— Lé hun çawa û ji bo çi hatin ?

Dîsan Bozan bersiv da:

— Apê min li vir çayxana wî heye. Gava ku hatibû wêlêt, hat mala me û ji bavê min re got: "Çi ye ev zarok mak-rok bêkar di ser hev de genî bûne ? Wan bişûne nik min, bi avfiroşiyê mabe

dê we xwedî bikin". Bavê min ez şan-dim. Lê bê dîsi diya min bû. Diya min çiqas kir nekir, çiqas li ber bavê min geriya negeriya bavê min bi a wê nekir û ez şandim. Giriyê ku diya min li dû min kir, ez tu caran ji bir nakim. Di destpêkê de min pir dixwest ku ez we-rim Izmirê. Lê niha ez pir poşmam bû me. Xwezi ku min bi a diya xwe bikira û ez nehatima. Li welêt tu kar tunebû. Bavê min û diya min ji bo kar pevdicûn. Diya min tim ji bavê min re digot: "Bavê min kûçik be, ez hew di vî hundirî de disekinim. Qe tu jî weke xelkê ji xwe re karekî bike. Ma tu rew-şa me nabîne". Bavê min jî bi ser de diqiriya û digot: "Keçê ma ez ê ci karî bikim ? Ma tu nabîni ku ez hertim li kar digerim ? Ma qey ez naxwazim ku zikê zarokên min jî têr bin weke yêñ xelkê ? Hili, ma qey ez naxwazim ? "

Gava ku bavê min û diya min pevdicûn, min nedixwest, ku ez di hundir de bisekinim. Min dixwest ku ew bi min re pevbîçinin, bi hev re pevneçinin. Min qet debar nedikir. Min dix-west ku ez karekî bikim, ku êdî diya min û bavê min dilê hev nehîni û bi ser hev de neqîjin. Peşî min barkêşî kir. Gava ku diya min dît ku pişta min diê-şe û ez bi şevan nikarim razêm, nehişt ku ez êdî barkeşîye bikim û got: "La-yê min, ger ku tu kanûbe ji xwe re ka-rekî din bibîne, dev ji vê mîrata barkê-şiyê berde, jehr di nav van peran de be. Pişta layê min ji peran bi qimetir e".

Her ku dicû eşâ pişta min zedetir dibû. Gava ku ez hebekî zêde bimeşa ma, janê dida pişta min û ez ji qidûm diketim. Min rabû dev ji barkêşiyê berda û min dest bi boyaxkeriyê kir. Lê jiyan ji boyaxkeran re tunebû. Her ku çawîşen belediyê em digirtin, sindoqen me dişkandin û em didane ber şîmaqan. Dawî dawî, min dev ji wi karî ji berda. Lê gava ku apê min hat, qala Izmirê û karê Izmirê kir, bavê min ez xistimserê xwe û ez şandim. Çend ro-jen destpêk min hin pere dane hev û li ser navê apê xwe ji malê re şand. Lê tu dibine, em hertim di bin saw û tîrsê de ne. Gava ku em têr girtin jî mala me wêran dibe.

İcar polis ji Misto pîrsî:

— Dê û bavê te ji li welêt in an li vir in ?

— Bavê min tune, lê ez û diya xwe li vir in. Pişti ku bavê min hate kuştin, xalê min mala me bar kir nik xwe.

Polis wa bi şasmayî pîrsî:

— Bavê te hatiye kuştin ? ..

— Erê, bavê min hatiye kuştin. Bavê min barkêşîya qaçakkeran dikir. Canê wî hertim ti talûkê de bû. Carna jê bi mehan me ew nedidit. Şevekê saet çar-re şevê li tixup xistin, da ku derbasbî

binxetê bibin. Lê, wan û leşkeran li hev tegandin. Hingî mirov digot, qey li Nişebînê ceng e. Heta bi saet heftê sibê weke mirov xwe bavêje agir teqîna tifeng û bomban dihat. Wê şevê heta bi sibê xew nekete çavê min û diya min. Me xwe li hev dipêça û em digiriyân. Diya min li ser hev dia dikir û got: "Qe icar jî bayê te bîflîtiya, bes bû. Bi-la bes bi vê mîrata qaçakê re bîlebiki-ya".

Saet heft - heft û nîvê sibê dengê te-qîna tiving û keleşkofan hate birin. Pişti wê bi saetekê me bihîst, ku neh qaçakker hatine kuştin. Ez û diya xwe ji hundir derketin û me ber bi tixup bazda. Hin em negîstibûn nîvê bajîr, me dît ku tîrîmpelek leşkeran sekiniye û kuştıyan dixin traktorekê. Li dora tîrîmpelek pir mirov hatibûn ser hev. Te ax biavêta li erdê nediket. Min û diya xwe, xwe di nav qerebalixê rakir û em çûn ser kuştıyan. Kesî kes nasnedikir. Yêñ serê wan jê bûbûn, yêñ dest û lin-gêñ wan... Ku ne ji kincen bavê min buya, me ew nasnedikir. Nîvê serê wî fîriyabû.

Edî hew tiş got. Sê - çar dilop hêşir ji çavan hat û be deng ma. Polis hilma dawî li cigara xwe xist û avêt. Wer xu-ya bû, ku pir hêrs bûbû, cigarek din ji vêxist, li dora xwe niheri û bi dengeki nizim got:

— Berî ku komsêr were divê ku em awakî bikin. Ger ku komsêr were xela-siya we tune. Hun ji deste wî bêbavî xelas nabin. Pişti saetek din ew li ku be dê bê.

Bozan wa bi heyecan:

— Ma em çawa bikin ? Ka tu rîkê nîşanî me bide !

— Binerin, ez e ji we re pacâ tuwaletê vekirî bihêlim, Paca tuwaletê bi sê nîf-tîn hesin tê girtin. Şansa we heye, ku hun niha hatine girtin. Ger ku hun pişti du mehîn din bihatana girtin, dê ev imkan ji we re tuneba. Ji ber ku neza-retek nû ava dîkin û tuwaleta wê neza-retê bê pacê ye. Dê, ne hewce ye ku em dirêj bikin. Komsêr li ku be, wextî bê. Gava ku komsêr were dê ban we ke ji bo ku ifada we bigire. Ji xwe dê rast we bişînî mahkemê. Lê berî ku we bişînî mafê we û çûna tuwaletê heye. Hingî hûn bêjin, em dixwazin herin tu-

waletê. Yek ji we pêşî here, ava ku mi-rov pê desten xwe dişo vekirî bihêle, dû re ê din here. Bi vî awayî hûn û herdu jî azad bibin. Lê dibe, ku hun bêñ girtin jî. Hingî hûn nebêjin ku min ev re nîşanî we da ye, ha !..

Herduwan bi hev re gotin:

— Na, na !

Polis desten xwe di serê wan da, çav da wan û ji nik wan çû.

Pir tê neçü, komser hat. Cigara wî a marlboro di devê wî de bû û derbasî odê bû. Berî ku rûnê, pakêta xwe a marlboro avêt ser masê û destê xwe da ser qonçekê, çayêk xwest û rûnişt. Dû re ban hin polisan kir û li girtian pîrsî. Di wî nîvê de, Bozan sê - çar caran li ser hev li derf xist. Polisekî navsere û rûtiş bi wan ve hat.

— Ci ye, hun ci dixwazin ?

Bozan herdu desten xwe xist nav çipen xwe û got:

— Zû derî veke, min bi xwe de mist.

Polis derî vekir û got:

— De ecele bike. Divê pênc deqîqan derbas nebe.

Gava ku derî vebû, Bozan bi lez ber bi tuwaletê reviya. Polis bi dengê xwe û galind û gur ji Misto re ji got:

— Ger ku tu jî dixwaze here tuwaletê here, an na tu hew karî here tuwalet muwaletan. Pişti bîst deqîq din em û herin mahkemê.

Hin peyva polis di dêv de bû, Misto ji ber bi tuwaletê reviya. Gava ku Misto kete hundir tuwaletê, Bozan tê de tunebû. Hema wî jî zû zû desten xwe avêt hesinê pacê û bi jor ket. Bozan xwe xelas kiribû û ji der ve li benda wî sekinî bû. Gava ku Misto jî xwe ji pacê avête jêr, herduwan bi desten hev girtin, bazdan û ketin nav qerebalixê.

Polis li derê tuwaletê xist û bi hêrs got:

— De haydê, ecele bikin, tenê deqêke we ma ha !

Tu deng ji hundir tuwaletê nehat. Lê tenê avê dikire xuşîn. Polis dîsa li derî xist, gava ku tu deng ji hundir nehat, derî vekir û kete hundir. Ew ci bibîne, ku pacâ tuwaletê li ser pişte û tuwalet vîkîvala ye.

Helbirawim min le yarı nazenin
Derkirawim min le xakî dilneşin,
Bûme aware w perriwey dûr wilat
Kewtime nêw wîrdedawî rîy necat.

Hêmin

**HOZANÊ
GEL**

ŞIVAN

Cihançir Soro

Em dibêjîn muzika gel. Erê, muzika gel ji nav gel derdikeve, gel guhdar dike, jiyana gelêr ya rojê, hêvi, derd, kul. Xebat û danustandinê sosyal dî civatê de, evana hemû dî muzik, stran, helbestê gelon da hene. Yênu ku van stranan, helbest û serpêhatiyênen gel dibêjîn, ji wan ra tê gotin, hozanê gel. Evana kêm an ji zêde tênen dizanin, lê belê ferqa muzika gel û bebetênen din yênu muzikê çi ne? Wezifa muzika gelêri çi ye û çawa ye? Dî nav gelê Kurd da cihê muzikê çi ye? Ji bo em bîkarîbin berseveki bî giştî bigrin, çak e ku em li di-

tinêni miroveki pîspor meyze kin. Marxisteki Swêdi ku profesorê ilmê muzikê, ye di vê meselê de weha dibêje; "Prensibê bingehi yê muzika gelêri; beriya hemû tuşti, bê ku ew muzika bête nivisandin û çapkirin dikare jiyana xwe bidomine. Stranên enstrumenatal û stranên gelêri bes ê ji ber enteresa muzik ve tê fêrbûn û bî vi awayi ji muzika gelên li der û dor belav dibe, zêde dibe û ji nesilê derbasi nesilê dibe. Ji wê re ji dibêjun muzika bi dençan ji muzika bi gotin. Rûp. 9. Muzika gelê Swêd". Welateki ku lê muzika li wê der muzika bi dev bî hêz e, welatê me ye. Beri nuha bî sedsalan, gelek hozanê Kurd yêni gelî, adetê muzika Kurdi ya bî dev ku pir dewlemend û heja ye, zêde kirine û alikari kirine ku ev babetê muzikê li welatê me nemire. Sebebên ku muzika geleri li welate me xurt e û xwedi dirokeki dewlemend e, pir in; Yekemin dî welatê me, Kurdistanê da hejmara xwende û nivisevanan heta nuha gelek kêm e, duwemin, zmanê me qedexe ye, sêyemin, welate me di bin zulmeki barbar de ye, çaremin, imkanen maddi yêni welatparêzen Kurd gelek kêm bû ne ühw. Sebeb pir in. Ji ber van sebeban ji muzika gelê Kurd ya gelêri di nav çarçeveki teng da ma ye û di hinek wext û rojan de hatiye guhdarkirun. Qet ne be burjuwaziyê xelkê ji bo ticaretê ji be, muzika gelê xwe belav kiriye, lê burjuwaziye Kurd ew vazifa xwe ji naniye cih. Lê belê mixabin bî pêşkevtina teknik va bî milyonan mirov bûn xwedi Radiyo, Teyp, Tv. Evana tiştên berbiçav in û em dikarin bibêjin ku muzika gel bûye hêzeki maddi û kulturi li Kurdistanê ji.

Eger em dengbêjîn eşiretên Kurd nehejmîrin, em dikarin bibêjin ku di van salêni dawi da, pir hozanêni welatparêz derketin meydanê. Her yeki ji wan hozanêni bî babetê xwe, stran û helbesten xwe dibêje û bî vi awayi alikariya muzika gelê Kurd a dewlemen dike. Cihê her hozani cihê ye. Emê di vê nivisara xwe da, li ser welatparêz, cep, hunermend, dostê gel û dengê Kurdan li welat û li derva, ŞIVAN bîsekînin. Hozan ŞIVAN ne bes di nav gelê Kurd da tê naskirin, Ereb, Ecem û Turk ji wi baş dinasun. Em nuha mëze bikin, bê cihê ŞIVAN ku der e.

CİHÊ ŞIVAN

Weke me li jor got, ev salêni dawi, gelek hozanêni granbuha derketin pi-

yasê. Ji vana nesilê kevn yêni naskiri, wek M. ARIF, H. CİZRAWI, İ. BERWARÎ û MEYREMXAN ühw, ji zaniyariya muzik mahrûm in. Muzikê lêdixin, dibêjin, diğerin û gel hej wana dike, lê belê ew hozan bixwe, rola sennet e muzik ya diroki - kulturi zêde fahm nekirine. Ev rastiyekei civata me ye. Ji ber vê rastiyeji problemen wan senetkaran yê naveroki heye. Em xiyla xwe baş bidin muzika Kurdi ya kevnar (hozanê ku me li jor bahsa wan kir), bi pirani stranên mistik, dini û gîrîdayî qedere, di vi wari de ditinêni wan hozanan li ser evînê ji çewt û qurmiçi ye. Ew raman û kiyemetêni ku ew stran belav dikin, alikariya pêkhatina şexsiyet û têgîhiştinêni çewt dikin. Bi wan raman û kiyemetêni ku ji realite dûr in pir mirov ideolojiya xwe dixemilinin û jiyana xwe li gor vê dimeşinim. Di terbiya mirovan de, muzik yet ji wan hêjayiyêni ku roleki baş dileyize ye û alikariyê dike ku mirov mentalita civata xwe baştur têbîghî. Ji ber vê yekê naveroka muzikê pir giring e. Li cem hozanê me yê kevnar têgîhiştuna welatparêzi pir hindik e. Muzik weke kef e û ji bo birkirîna derde rojane, tê ditin. Xêza ku hakimi vê muzikê ye ev e; em kîyf bikin, cihan vala ye, ax û off, derd û kul ühw.

Dî vê çarçewa ku me li jor çekir û bî kurti bahskır. Pêwist e mirov alikariya guhertin û xwenûhkurma ku hozan ŞIVAN destpêkiriye baş tê bighe. ŞIVAN temayuleki nû di muzika Kurd ya gelêri da pêkani û bî xwe ji hin ji serokatiya vê temayulê dike wesfê vê muzika gelêri ku li ser bîmgeheki gelên welatparêzi awabûye ji muzika gelêri ya kevn cihê ye. Ew temayula muzikê beriya her tiştî çep e, welatparêz e û bî ritim û melodîyekî gelek xweş tê gotin. Wesifeki din yê giring ku di muzika ŞIVAN da he ye, tekoşerîye, ev muzik ne pasif lê belê aktiv e, ne razayı lê şiyar e, dost û dujînan ji hev cihê dike û li cem gele kedkar cih digre. Dî vi babeti da muzika gelêri ya kevn derbas dike û xebeti nû pêk tine. Weke tê zanîn muzika gelêri ya kevn li ser jivan, evin, zevk û keyfa çîna serdest dîsekîne. Bi taybeti ji bo axan, began, şayxan û dewlemenden pesnê bê pivan dike. ŞIVAN di nakokiyâ civatî da li diji serdestan cih digre û hemû muzika xwe li ser vê rastiye awa dike û gel ji di vê rastiye de rehni dike. Muzik li cem ŞIVAN dike alet ji bo rohnikirna gelê belengaz.

NAVEROKA MUZIKÊ

Bî taybeti perçeki muzikê ji çend tuştan ava dibe û ewana avahiya (struktur) muzikê pêk tinin. Weke misal em dikarin bêjîn ku perçeki muzikê ji melodi, ritim, aheng, deng û naverok pêk tê û bî hev ra ji ewana karakterê muzika şanî me didin. Hemû perçeyên muzikê giring in. Bî hev ra hemû perçeyên muzikê xebateki pirali, gur, xweş û hunermendi nişan dide. Weke misal, mirov nikare bibêje ku melodi ji ritim giringtûr e an ji ritim ji ahengê baştar e, hemû perçeyên muzikê rola wan cihê cihê ye. Lî vê der emê bes li ser naveroka muzikê bisekinin. Dî welatê me da rola danustandina bidev, pir mezin e û ji bav û kalan de di navbera gelê me de ew babetê danustendimê rû-nuştîye. Gotinê ku ji guh diçin guh, li welatên wek Kurdistanê ku hejmara xwende û nivisevanan lê kem e, gelek tesireki xwe yê mezin heye. Ji ber vê yekê ji muzika weke sinet di welatê me da, roleki xwe civati - kulturi giring heye.

Dî muzika gelê Kurd da, ŞIVAN bî guhertuna naverokê va, dest bî xebata muzikê kir. Ew guhertina naverokê weke me gó, xwedîyê bingeheki gelên welatparêzi bûye. Dî stran û helbestên xwe da, ŞIVAN li ser kolonizekirina Kurdistan, liberxwedana gel, rohnikirina belengazan, têkoşeriya û qehremantiya gelê Kurdistanê dîsekine. Ew helbest û stranên welatparêz bî ritim û melodiyên xweş û bî zmaneki rehet va tê xwendin. Nenastiyê di civata me da, bî babeteki ku guhdara zêde aciz ne ke û bala wan wunda neke tê gotin.

Ew guhertina naverokê, paralek bî xebata rizgarixwazi gel û bî xurtbûna hêzên welatparêz va diçe. Stran û helbestên ku têne gotin, gel qebûl dike û wana dike yên xwe. ŞIVAN bî zmanê gel dibêje û gel ji digot ew "yê me ye, bahsa me dike". Bî vi awayî danustandineki gelek xurt, di navbera vê muzika welatparêz û gelê me de, pêk tê. Tebeqê sosyal li Kurdistanê weke xwen devan, gundi û ronakbir, vê muzika welatparêz digirin himbêza xwe.

Ji bo em bikarîbin vê yekê berbiçav bikin, em hinek misala meyzekin; sa-lê 1960 - 1970 li Kurdistanê bî hezaran xort çûn bajarêñ mezin û dibistanê bilind dixwendin. Piraniya van xwendevanan ji bo armanceki baş çûbûn xwendimê. Lî dibistanê bilind pir mirov hisêñ welatparêzel pê ra çê di-

bûn û li diji zulm û barbariya ku li Kurdistanê heye derdiketin. Dî banta ŞIVAN ya yekemin da xortê ki bî ŞIVAN ra dikeve diyalogê. Û li ser mesela welat, rola xwendevan û ronakbiran va straneki bî hev ra dibêjîn (di bandê da her du kes ji ŞIVAN e). Naveroka stranê bî kurti ewaya ye; Xortê Kurda divêt bixwinin, tê bighêñ, û ji bo rizgarbûna gelê xwe xebat bikin. Bî kurti xort vana ji Hozan ŞIVAN ra dibêje û ŞIVAN bersiva xort weke nêne-re xwendekarê Kurd bersiv dide. Perçeki ji stranê wuha ye;

*Wa ji Kurdistanê ez têm
Geli xort û keçen rind,
Min silavê dê û bavan
Bo we anîne ji gund.
Dibêjm me hun gryandin,
Bo dibistanê blind
Da bixwinim bo welatê xwe
Bîbin çura û find.*

Bî wan gotinê xortê qasid dest bi stranê xwe dike. ŞIVAN ji bî dengê xwe yê şewati û zurav bersiva qasidê Kurdistanê bî vi awayê jérin dide;

*Ew silavê dê û bava
Lî ser ser û çauê me hat.
Lî dibistana em dixwinin
Tîm dîbin doza welat.
Ji bo Kurdistana rengin
Em dikm cehd û xebat.
Da ku Kûrdêne me yêñ hêja
Bîbinin roja Felat.*

Gelê Kurdistan hêvi yên pir mezin ji xwendekar û xorten xwe dike û bî ritya qasidê xwe hêviyên xwe ji xwendevan û ronakbirê Kurd ra dibêje. Heger em li naveroka stranê meyzekin, emê bikeribin hinek tesbiten kulturi û civaki li Kurdistanê bibinin. Civata Kurdistanê di nav guhertineki sosyal û kulturi de diherike. Hejmara xwendevanan zêde dibe. Û bî vê zedebûna hêviya gelê Kurdistanê ji bilind dibe. Em li vir dikarin bibinin ku welatparêzen Kurdistanê ji bo xelasiya gel cehd dîkin û dî vê xebatê da xwedi bir û baweri ne. Ewana ji işaretê guhertinê diroki - kulturi yên civata Kurdistanê ne. ŞIVAN ew guhertin û nuhbûna diroki - kulturi di wexta wê da dit û li ser bî cuwamêri sekini. Em dikarin bêjîn ku yek ji wan sebebêñ mezin ku ŞIVAN li Kurdistan hate naskırın û bû hozanê netewi yê Kurdistanê ev bû. Lî derveyê wêya ji deng, û babetê muzikê ŞIVAN kire hozaneki naskırı.

LIBERXWEDANA GELE KURD

ŞIVAN di muzika xwe da li ser gelek meselêñ kulturi, sosyal, evini û hw,

dîsekine. Yek ji wan meselêñ ku pir têñ bikaranin, mesela li berxwedana gelê Kurdistanê ye. Dî diroka me ya modern da gelê Kurdistanê, li diji duj-min pir caran serihildaye. Her çığas ev liberxwedanê gel, bî awayeki barbar ji hatune şikêndin, gelê Kurdistanê serê xwe ji koloniyalistan ra dananiye. Gelê Kurd bî mîr û jînêñ xwe, bî keç û xorten xwe, bî pir û zarokên xwe ve liberxwedaye, perişan bûye, hatiye kuştin, bê xane û nan maye, lê belê zincirê koletiyê qebûl nekuriye. Lî Dêrsim, Koçgiri, Agri û hw, adetê Kurd yê liberxwedanê bî alikariya stran û helbesten xwe bî zmaneki hisi û dilşewati, berdewam kurye. Ew helbest û stranen ji bo şexsiyeta netewi ya Kurd pir giring in. Perçê ki ji hebûna gelê Kurdistanê, stranen wi bixwe ne. Stranen li ser Dêrsimê, Koçgiriye, Agriye û hw. têkoşina welatparêz ya germ dîkin, morale militanan bilind dîkin û rojîn tarî rohni dîkin.

Lî ser berxwedana gelê kurd pir stran hene. Ew stranen mirâşen qehremantiya gelê Kurdistan in. Ji aliyeki da ji ev stranen liberxwedanê ne. Şexsiyet û psikolojiya Kurdan ya netewi bî awayeki edebi rê me dide. Mentalita Kurdan di wan stranen da gelek zelal dibe. Weke misal em dikarin banda Gulistan ya sisîya (3) bîdin. Dî vê bandê da Hozan ŞIVAN stranen gelek dilşewat li ser Dêrsimê dibêje. Em guhê xwe bîdin wan misra yên jérin.

*Bûka delal, bûka me
Bûka Kurdistan,
Destê xwe dide çiyan
Dide tifing û rexstan
Destê xwe nade neyaran.*

Melodi, harmoni û ritma vê stranê bî awayeki dilşewati û mirovati, bî bartarı û zulma ku Dewleta Turk li Dêrsimê kir, tê girêdan. Mesela bingehin di stranê da; li berxwedana gelê Kurd e. Bûka Kurdan di stranê, divêt sembolik bê fahmkirin, bûka Kurd, mirovê ku liberxwedide û teslimi duj-min nabe sembolize dike. Dî vê der da mirov baş dikare bibine ku namûsa mirova welat û serbixwebunê e. Mirovê ne welatperwer namûse, weke mal û mulkan ji jîn dibinin, mirovê welatparêz ji dibêjîn ku namûsa serxwebûn e. Dî gelek stranen xwe da ŞIVAN namûse bî serxwebûnê, azadiyê, welat û xelasiyê ve gûredide. Bî baweriya min, ji ber ve yekê ji, ŞIVAN bûye hozanê gelê Kurd yê netewi. Mirov hêvidar e ku ŞIVAN vê pozisyonâ xwe tu car ji bir neke.

SERFIRAZİ, JARI Ü KÊMASIYÊN BERBANGÊ

A. Tigris

Geli heval û Xebatkarê redaksiyonê,
Geli niviskar û xwendevanê Berbangê
yên hêja !

Dema ku mîn vê nivisarê nivisand, hêj kovara Berbangê 10 hejmar hatîbû çapkirin û belavkirin. Mîn van 10 hejmaran nûcar ve dî çav de derbas kir û pîraniya nivisaran bî çaveki rexne, li serad û bêjîngê xist. Mîn li gor zanabûn û birûbaweriya xwe gelek serfirazi, jari û kêmasyêñ kovara Berbangê dit. Ez dê, dî ve nivisara xwe de bî teşeki kurt van serfirazi, jari û kêmasyan raberê we xwendevanen bikum.

Serfirazi û serketina Berbangê ya heri mezin derketin, weşandin û belavkirina wê ye. Bî rasti, kovareke 24 rûpel, peryodik, nûjen û hin ji, bi seranser bî kurdi kareki hêsa nine. Jê re xebat wext û divayi (imkan) diwê ! Serfirazi û taybetiya Berbangê yet ji, jê ev e, ku kovara Federasyona Komelêñ Kurdistanê ye. Wê pişa xwe daye gelek hêj û rexistimêñ politik. Berbang, h Swêdê dî ware weşani de sembola hevkari û yekitiyê ye.

Disa, ew cara yekem bû, ku li ber awira gelempéri ya Kurd, li ser Alfaba kurdi raberizineke cidi û zanisti hat vekirin. Daxwaza hemû welatparêz û pêşverûyên kurdan ev in, ku ev rewşa ha dom bike. Ew raberizin tenê ne dî derheqê Alfaba Kurdi de bûmine, dî hemû mijaren gelş û sereşanê zmanê Kurdi de vebin. Diwê ev raberizin (minaçşe) bî şeleki zanisti, fireh, hûr û kûr hemû gelş û lecén grametik û wêjeya (literatora) Kurdi bide ber xwe. Heta iro, veşartın û xunaftina gelş û lecen zmanê kurdi, li peşîya pêşveçûna zman û wêjâ kurdi gelek bend û pingaran çêkrine. Iro pêwist e, ku ji her ali ve gelşen zman û wêjâ Kurdi, ji yên hur heta yên gir, mirov hemûyan derke holê û li ser wan bisekine û birûbaweriyan xwe yên zanisti û rast raber bike. Her zmanzana, pispor, niviskar û mostenê Kurd diwê li ser vê mijara ha serê xwe biêşine û afirandinê xwe pêşkêsi awura gelempériya Kurd bike. Pêwist e, ku platformen raberizinan û bîryar girtinan çêbin. Berbang ji karê ji van platforman bibe yek. Diwê bibe ji.

Çaxa ku em, li diroka wêje û wêşanêñ Kurdi dinérin, kovar û rojnameyên Kurdi, bî tevi jiyan qot û kurt in. Sede-men bingehi û serekiya wan weşanen

kurdi yên jiyan qot û kurt, abori, politik û kêmasi û jartya niviskaran di seri de têñ. Her çiqas iro li pêşîya Berbangê ji ev pirs û pingar sekandi bin ji, lê ne wek weşanen din e. Piçek be ji, dî vi ali de şans û divayîyêñ Berbange heye. Ger redaksiyon, niviskar, komelêñ endam û xwendevanêñ Berbange hinek ji xwe bûlinin û bêşinîn, karin gelek pengafêñ erêni û çak blavêjin.

JI HÊLA TEŞA Ü PERGAL VE BERBANG

Kovara Berbangê, li gor rewş û şela Kurdistanê ya iroyin û li gor divayı û gengaziyêñ politika netewi ya rizgari, zman û wêjeya Kurdi bî şeleki bingeh ne hatîye pergalkirin û raxistin. Dî vi wari de kêmasyêñ Berbangê yên giring û mezin hene. Jî ber ku ev rewşa teşeyî û pergâl bî rewşa politik ve gûşdayî û humandi ye, ez dixwazîm vê rewşa ha dî besen politik - Daxwazû pêşniyazan de raberi bikum. Jî bûl van mijaran dî pakbûna rûpelan de pêşveçûnek ji heye. Lê hm kin û kêmasyen din ji têndomandin. wek: Dî hejmar 2, rûpel 17; hejmar 6, rûpel 7, 11, 15; hejmar 7, rûpel 15; hejmar 8, rûpel 19' an de bî xezikên xurt û gûr rûpel ji hev hatine cudakirin. Sernivisarêñ ku bî tipêñ gûr i klasik hatîne nivisandin, hema hema bî yek curekê ne. Gelo tepêñ cûre - cûr bî karanin ne baştırin ne ? Ka em xwe bidin van nivisaran: Hej. 1, rûpel 6-7; hej. 2, rûpel 8; hej. 8, rûpel 7-10 û hwd...

Pîraniya nivisarêñ Berbange, li ser 3 stûnan ten nivisandin. Hin nivisar li ser yek (1) an ji li ser du (2) stûnan bêñ nivisandin, baş na be ?

BERBANG Û NIVISKARÊN XWE Û ZMANE KURDI

Wek em hemû pê dizanin gelş û pingar in ku li pêşîya zmanê Kurdi ne, ne hîndik in. Jî lew re heta niha saziyeke nivisê yê fermi nehatîye avakirin. Li ser zmanê Kurdi disa heta niha lêkolîn û lêgerinêñ tevi û zanisti ne hatine çêkirin.

Kesêñ ku heta iro dest avêtine pêñûsa xwe û bî kurdi nivisandine, devoka dorhêla xwe ya teng bî karanine û tînin. Hemû afirandin û hilberinêñ Kurdi li ber çavan in. Dî vê wari de rewşa Berbangê ji, ji yên din baştırin ne. Her nivisareke Berbangê di vê wari de minakeke berçav e. Jî redaksiyonê

re bareki guran û giring dikeve: Cavde-ri. Pêwist e, ku redaksiyon hemû nivisarêñ ku di Berbangê de bêñ çapkirin û belavkirin, wan yek bî yek dî çav de derbas bike. Kêmasi û çewtiyêñ wan rast bike. Em, niviskar û helbestvanen nû û naman bidin aliyeki, ew kesen ku niviskar û helbestvanen Kurd yên bi nav û deng in û heta niha xwendiyê ko-var, rojname, alfabe û pürtukan in, çewti û kêmasyêñ wan bê hejmar in. Mirov, ew nivisarêñ wan yên ku di Berbangê de derkette bigre û binê çewti û kêmasyêñ wan yên gramatik xêz bike, nivisarêñ wan dê bibim weki cotê mehâ biwarê. Diwê mirovê niviskar, helbestvan û pişkar dilpiçük û sernerm be. Rikoki û zanisti dij hev in.

Bî kîn û kêmisi Celadet Bedirxan, 50 sal berê bingehê gramatika zmanê Kurdi avetiye. Jî wê rojê heta iro li ser vê bingehi gelek peşveçûn çêbuye. Dî warê zman û rîzmanâ Kurdi de ji Berbangê re berpirsiyariyeke guran û giring dikeve. Diwê bî şeleki zanisti vê bingehi biparêze. Rê neđe berdana, xirabkirin û lewîtandina zmanê Kurdi. Bê şik ev nayê vê mane ku di zmanê Kurdi de qet guhartin neyi çêkirin. Li gor zagona diyalektik zman ji di nav pevajoyê de tê guhartin. Hemû zmanê nivisê wîlo hatine guhartin û têñ ji. Dê zmanê Kurdi ji bîbe. Lê buyeren Berbangê durê vê tiştî ne. Her kes bi serê xwe rîzmanek derdixe. Fermo em li çend minakan binêrin:

Gelo di seride navê xwendiyê kovarê çewt ne hatîye nivisandin ? Li gor rîzmanâ Kurdi "Kovara Federasyon a Komelêñ Kurdistanê li Swêdê" bahatan nivisandin, ne rast bû ? Li gor rîzmanâ kurdi, çaxa ku ji yekê zedetur daçek (veqetandok) bîn, ya yekem pê têne tê nivisandin û yên din pêwist e, ku cuda bêne nivisandin.

Zmanê Kurdi di gruba Hind û Ewrupayî de ye. Di gruba Hind û Ewrupayî de pêşdaçek (pêşpurtik) bî bêjan ve tu-cri nayê nivisandin. Di Kurdi de daçekên paşin ji tu cari bî bêjan ve nayê nivisandin. Ger mirov li vê yekê diçat neke û bî hevre binivisine, di gramatikê de ji vê rewş û buyere re "qetliam" tê gotun. Ka ez çend qetliamêñ gramatik diyar bikum:

"Heta bîhustek erd

Jî minra bîmine

Dareke zeytinê bîmine mira" (hejmar 8, rûpel 16)

"Dijminêñ devbexin..." (hejmar 8, rûpel 16)

"Çiroka Behram Gor" (hejmar 4, rûpel 20)

Bê şik di her hejmarêñ Berbangê de lêkera "bûn" dema niha çewt hatîye nivisandin. Gelo ev serekniwasir ji, ji

aliyê redaksiyonê ve nehatibû ditin ? "Zarok şerinê malane û zman ji kilita dilane" (hej. 4, rû. 10)

Em dom bikim. Dî hevokekê de çend çewti hene:

"Multeci kiye, şuna wi çiye, mafêñ wan çime" (hej. 8, rû. 8, stûn 3, pragraf 3).

Dî kurdi de du (2) tipêñ dengtêr na- yêñ keleka hev. Tipa "y" dikeve nav her du tipêñ dendêr û herduyêñ bî hev re gredide. Lê Berbang vê rêzdara ha ji nasnak e. Wek:

"Bî tevai ruyê me ronakbirêñ kurdan reş e" (hej. 10, rû 10).

"Newroz rojeke şaiyê ye" (hej. 9, rû. 5)

"Bêî wext derbaskirinê..." (hej. 10, rû. 4, stûn 3).

Berbang lêkerêñ alikar û lêkerêñ se- reke bî hev re dînivisine. Carnan ji lê- kerekê dike du (2) kit. Gelo, Berbang di warê yekitiya devokan de roleki çawa- van dîlize. Em bala xwe bîdin wê:

"Niha, nuha, neha, nik û nika"

"Wiha, weha, waha û wuha..."

"Wisa, wusa û usa...",

Dî eyñê mane de,

"Bla, bila, bir a û bra"

"Zarok, zarûk, zalu..."

Dîvê mirov bextereşyan ji neke. Rewş zelal û diyar e. Bar gran e. Berbang bî serê xwe nikare di bin vê bare giran de hêz bide xwe û rabe pi- yan. Lî kare bibe alikar û rîbrî. Hindiktrîn kare ci û divayiyêñ platforman pêk bine. Gelo Berbang çîma van prob- lemêñ zman û wêjeya kurdi, ji wan ni- viskar û helbestvanêñ xwe yêñ ku ji wejeya cihanê ya nav û deng agahdar in, û roj bî roj wê taçip dikin û dihêçin in, ji İBNİ RUŞT heta MONTAIGNE, HERAKLTİ, JEAN PAUL SATRE, ARAGON, PABLO NERUDA, D. H. LAWRENCE, ANTONIO GRAMSCI û A. GONÇAROV dinasîn re raber na- ke ? Bala van kesan nakşine ser prob- lemêñ zmanê kurdi ?

BERBANG Û ZARAVAYÊ ZAZAKI

Berbangê dî hejamîn xwe yêñ dawi- de, rûpelên xwe ji zaravayê zazaki re ji vekir. Bê şik ev pengafeke erêni û baş e. Ji bo yekitiya zmanê kurdi yê nivisê pêwist e, ku li ser her zarava û devokêñ kurdi lêkolîn û lêgerin bêñ çêkirin. Bi xebateke dûr û dirêj ve têveliyêñ nav zaravan û devokan, dîvê bê kêm kîrin û ber bî yekitiya zmanê fermi yê nivisê bê meşandin. Zmanê kurdi ji bêje û ki- têñ biyani bê paqikirin. Dî şûn wan bêje û kitêñ biyani de, ji zaravayêñ din bêje û kit bêñ hilbijartîn û bikaranin. Metod û navgin çi dibin bila bibin pêş- bir (armanc) yekitiya zmanê kurdi ye. Xebata li ser zaravan û devokan, dîvê ji bo yek armancêki be. Ew ji, ji bo yekitiya yek zaravayek û yek devokeke

be. Zmanê netewiyê nivisê û axaftinê yek e. Iro çawa xebata siyasi ji bo yekiti û rizgariya neteweyê kurde, wisa ji, ji hêla zman de ji dîvê xebat ji bo yekitiya zmanê kurdi be. Ne ji bo pêş- veçûna zaravan û devokan xebat bêki- rin ! Ger wisa be, xweza ew çax dijwari, berberi û tênegiştini yêñ zmanê kurdi kûr û pir dibe. Ev rewş û kar xwe - bixwe berberi û dijiti ni ne ? Em bi daxwaz û niyazêñ xwe yekiti û pêş- veçûna zmanê kurdi bixwazin û bî kar û barêñ xwe yêñ berçav û pratik ji, ji- hevketin û dûrketina zarava û devokêñ kurdi pêkbinin. Ev berberi û dijitiya heri mezîn e.

Ji bo yekitiya netewi, yekitiya zma- nê nivisê û zmanê axaftinê ji pêwist e. Yekitiya zîman li ser yekitiya siyasi tesir dike. Heşyarbûn û zanibûna nete- wi hin zû û zêde dibe. Ra û qurmêñ elîtiyê û feodalizmê pûç dike û ji bini de radike. Tekoşina civaki, çini dikeve gehinekeke nû.

Ji xwe politika her çar dewletên koloniyalist yêñ, ku Kurdistanê di nav xwe de kirine çar perçe, yek jê ev e, ku yekitiya kurdan ji her aliye ji navê rakin. Hin aliye civaki, siyasi, diroki û hin ji, ji aliye zman û kurtur ve. Ar- manca wan belavkirin û ji navê rakirina neteweyê kurde. Dî vi wari de mina- kîn berçav û jiyandar hene. Rewşa kurdêñ soran, kurmanc û zaza berça- van in. Dî kongrîn Federasyona Kome- lîn Kurdistanê li Swêdê de çîqas ji hev fêm kîrin ? Çaxa dikevin tengasiyê bî hev re Swêdi napeyin ?

Dibe ku hînek kes bêjin, ku dibêjin ji "çîma çîkîn zaravê kurmanci zêde zaravayê dim e ?" Belê doz û pîrs ev ni ne. Beri her tuşti doz doza neteweki ye. Dîvî mirov wisa li dozê û gelşê bînêre. Dîvê mirov tucarı ji bir neke, ku ji mercen hebsîna netewi yek ji zmanê netewi ye. Çaxa ku zman tunebe nete- we ji dike ve xeterê. Ji ber vê yekê yekitiya zman pêwist e. Îcar kijan zarava bîngeh û sereke bê pejîrandin ?

Iro li Kurdistanê ji 20 milyonî zêde- tir kurd dijin. Ji vi bist milyoni kîmasi 15 milyon bî zaravayê kurmanci diaxi- fin. Ev yek. Ya duyemin ji, yêñ ku bî zaravayêñ din diaxîfin ji sedi heftê bî kurmanci diazin. Lî kurmanci bî zaza- ki û sorani nîzanî. Piraniya stran û folklor bî zaravayê kurmanci ye. Bî kin û kemasyîn xwe ve be ji, bû 50 sal e, ku bîngeha rezmana zaravayê kurmanci batiye avêtin. Zaravayê kurmanci li gor zaravayêñ din gelek fireh û dewle- mend e. Bî zaravayê kurmanci heta iro gelek afîrin û hilberin hene. Rewş ev- gas zelal û vekri, li ber çavan e. Berbi- hevhatin û yekitiya zaravayêñ kurdi, yekitiya netewi temam dike. Yekitiya

zmanê kurdi yekitiya netewi xurt û geş dike. Ew ji riya serxwebûnê û riz- gariyê vedike û nêz dike.

JI ALIYÊ POLITİK Û IDEOLOJIK VE KÊMASI Û JARIYÊN BERBANGÊ

Rewşa Berbangê ne wek rewşa or- gan yêñ weşan yêñ biyaniyan yêñ din ku li Swêdê ne. Ev rewş ji, ji taybetiya Kurdistanê tê. Ji ber vê yekê têveli û taybetiya Kovara Berbangê dîvê hebe. Ev taybeti û têveli ji hêla politik û ide- olojik ve ye. Civaka kurd ya li Swêdê, bî xwe civâkeke tenegezar i politik e. Ji xwe avakırına Federasyonê ji aliye çend komeleyên ku giredayiyêñ rêxis- tinêñ Kurdistanê ve ne hatibûn pêk- anin ? Armança pêkanin û demandina Federasyonê ev bû û ev e, ku piştgiri û alikariya serê rizgariya Kurdistanê bi- ke. Hemû xebatêñ xwe ji bo vê arman- çê pêkbine. Lî Ewrupayê û bî taybeti li Swêdê doza Kurdistanê bî awira gelem- periya Swêd û Ewrupayê bide nasan- din.

Bî ya min Berbang vê berpîsiyari û vatîniya bîngehi û sereke wek berpîsiyari û vatîniyeke tali dibine. Berbangê berpîsiyari û vatîniya bîngehi û sereke çand û pişte daye pêsiya xwe. Dî vi wa- ri de pengafan davêje û kar û barêñ xwe didomine. Ji vi rewşa ha re şoleki- rin ne gengaz e. Deh (10) hejmarêñ Berbangê li navê ne û li berçav in. Hej mar bî hejmar kovar ji aliye politik û ideolojik ve jar û kêm dibe. Dî hejmarêñ seri de nûçe, buyer, şolekîrin û ni- visarêñ politik zêde ne. Kovar bî hej- marêñ dawi, ji doza Kurdistanê dûr ke- tiye. Bî vê rewşa xwe ya ha, dixwaze li Swêdê bîbe kovareke çand û pişeyi. Dev ji welat û gel berdide. Dixwaze li ser rîça kovaren Ewrupayê bumeşe. Ji vê yekê li ser navê wêjeya (li teratora) modern dest bî curêñ nivisorêñ popilist romantik û subjektizmê kiriye. Berbang, hejmar bî hejmar ber bî xew, xeyal û çirokan ve diçe. Rewşa Berbangê hatiye vê gelîsekê ku bî zmaneki vekri û bî şeleke merxasi di- bêjin: "KURD BÛNE OLOMOV Û KURDISTAN JÎ BUYE OLOMO- VİSTAN".

Berbang dê di nêzde sala weşanî û belavkirina xwe tije bike. Dî dema we- şan û belavkirina Berbangê de, li Kurdistanâ Iran û Iraqê serê germ i çekdari dom dikir û dike. Li Kurdistana Turkiyê ji, di vê salê de bi- darda kîrin, kuştin, gutin, provayêñ tetbiçatên gelqrîkirinê hatin kîrin û iroj ji dikin. Lî, mixabin ji Berbangê deng demayê. Ji van buyerêñ mezîn û güring re guh û çavêñ xwe guttiye. Ker û lal e.

Wek kovareke biyani !.. Derdê serê derdan ji ev e, ku nûnerên wan hêzên çekdar û yên din ji di radaksiyona Berbangê dane. Gelo ev kes û hêz, kovare ji bo çi diweşinîn ? Dî warê demokratik de Berbangê re ji, ji bo nasan dîna doza Kurdistanê, kar û barek na keve ? Jî bo vê doza ha Berbang ji di warê xwe de navgineki (aleteki) ji navgînên propaganda û ajitasyonê ni ne ?

Bî rewşa xwe ya iroyin du (2) rê hî pêşîya Berbangê heye. Riya yekemin (1) ev e, ku kovar ji bo serxwebûn û azadiya Kurdistanê di warê xwe de û qasi ku ji wê re bar dike xebata xwe bî domine. Riya duyemin (2) ji,-kovar doza Kurdistanê bide aliye û li derê welat bibe kovareke ronakbirê Kurdistan. Pêwist e, ku riya yekem riya Berbangê be. Dî vi riya rast û demokratik de bumeşe. Riya duyemin mirina kovarê tine.

Em bî xwe di weşanêن xwe de li ser rewş û doza Kurdistanê nasekinin û nanivisinin Jî rojname û kovarên Swêd û Ewrupayê ji gili û gazinan dikin: "Çima ew di derheqê buyer û doza Kurdistanê de nanivisinin û bê deng diminin ? "

Diroka Kurdistanê bî xwin û agir hatiye nivisandin û yê bê ji. Lî dij kolonyalizmê, nijadperestiyê û her cu-rên zordestiyê gelê Kurd bî mîrxasi, bê hejmar seri hildaye û destbilind kurye. Dî rûpelên diroka têkîşin a gelê Kurd de rojên xawendar (bi şeref), Serfiraz û nav û deng hene. Ev roj û buyer tu-carı nayêni ji birkurun.

Divê em, wan roj û buyerên mezîn û giring piroz bîkin û ders û hêcandinê nû ji wan derxin. Min her 10 hejmarên Berbangê ji lihevxit û li wan mîzekir; lê ji derê 37 saliya Komera Mihabatê tişteki nedit. Ev ji nûça komelekê bû. Ev nûçe ji kin û kurt bû. Ma ser sari-yen ewqas mezîn ji dibin ?

Divê Berbang, çavê kovarên din yên ku giredayi yên rexistinan in, li xwe mîze ne ke. Ew kovar û rojnamê politika rexistina xwe didominin. Jî bo wan ev rast e ji. Lê rewşa Berbangê û wan ne yek in. Berbang platformeke fi-reh e. Kovar ji hêla demokratik û nete-wi ve siwana (şemsiye) hemû komele û kesen endam e. Divê neyê ji birkurun ku kovar û federasyon bî serê xwe ne tişteki ne. Bî hebûn û hêza xwe, deyndarê hemû komelên endam in. Divê federasyon û kovar piştgirti û alikariya

hemû komelên endam bike. Ü ji wan komelên endam ji alikari û piştgirti bixwaze. Heta 10 hejmar, kovarê deri yek nûçekê qet qala xebatê komelên endam nekuriye. Bi tenê nûçe û buyerên federasyone daye. Mirov dide xwe û eqîl, gelo ew komelên endam qet xebat na kin ? An ji baweriya wan ji federasyonê tune û federasyon ji formalite wê de tişteki nine ? Em, çaxa ku li kovarên federasyonê biyaniyan yên ku li Swêdê ne , dinêrin; ew bî xebatên komeleyên endamên xwe kefxwes û dulsa dibin. Rûpelên xwe ji xebatên wan re vekirine. Jî lew re federasyon ji aliye komelên endam ve têr pêkanin.

Jî bo Berbangeke hin baştrîn, ez dê hî jêr çend daxwaz û pêşniyazên xwe pêşkêş bikim.

ÇEND DAXWAZ Û PÊŞNİYAZ

- 1- Divê Berbang, di hêla demokratik, di navarok û çarçova xwe de, di şerê netewi i rizgarîya Kurdistanê de qasi ku ji wê re , vatini û berpîrsiyari dikêve, bî ci bine.
- 2- Divê quncîka diroka Kurdistanê di Berbangê de vebe. Lî ser roj û buyerên bohîriyên giring û mezîn nivisarên politik bîn nivisandin.
- 3- Dî her hejmar de li ser rewş û bu-yerên nû şolekîrin û nivisarên politik bîn nivisandin.
- 4- Divê kovar di her hejmarê xwe de ci bide xebata komelên endam.
- 5- Berbang û federasyon di derheqê problemên zman û wêjeya kurdi de platforman pêk binin. Wek; konferans kurs û civin...
- 6- Kovar rûpelên xwe ji mitoloji, jêber-mayı, tote, şin, şayı, yên kurd re veke.
- 7- Jî karên pêwistîrin yek ji, jê ev e, ku divê redaksiyon hemû nivisaran û na-man di çav de derbas bike. Jî bo hemû nivisaran hînek rîzdar û zagon an pêk bine.

- 8- Rûpela "Mendalên Mamoste" ji na-vê rake. Jî lew re ev rûpela ha, hîn ji aliye ideolojik, hîn ji aliye pedagojik, hindekari û perwerdekari ve çewt e û zerar e. Jî her ali ve ne li gor zarakan e.
- 9- Derengimayina kovarê aktueliya wê wende dike. Jî ber vê yekê divê kovar wexta xwe de derkeve û bê belavkirm.

Zor spas !

PÊKENİN

Rojekê gundiyeck diçe gundekî din, ku ji xwe re çêlekekê bistîne. Diçe gund û ji xwe re çêlekeke delal distîne. Benekî dixe stuyê çêlekê, wê dide dû xwe, dide ser rê û berê xwe dide malê.

Li ser rê pêrgî bist mirovên din dibe. Ew bist mirov jî di nava xwe de biryar didin ku xwediye çêlekê bixapînin û fenekê lê bîkin Pişti nêzîki hev dibin, bist mirov jê re dibêjin:

- Kuro te ev ker bi çiqasî sten-diye ?

Xwediye çêlekê ecêb-mayî di-mîne û dibêje:

- Weh, ev ne ker e, ev çêlek e heyran !

Bist mirov:

- Weh, yabo bi filan sündê ev ker e. Ma em nabînin ? ..

Xwediye çêlekê :

- Yabo bi xwedê ev çêlek e. Ma ez çêlekan nas nakim ? Va rengê wê sor e heyran !

Bist mirov:

- Ha, ho, ha ho, yabo bi tirba bavê me ev ker e. Em bîst mirov in. Ya me ji ya te rastir e.

Xwediye çêlekê xwe şaş dike. Ew ji êdî baweriya xwe tîne ku çêlek ne çêlek e, lê ker e.

Radibe ber bi paş ve vedigere û diçe mala ku çêlekê jê stendî bû û bi hêrs dibêje:

- Ji te re kera te, te ez xapan-dim. Ji dêvla çêlekê, te kerê da-yê min, ma ne şerm e ?

Ew ecêb mayî di-mîne:

- Weh, heyran ev çêlek e, tu di-bînî rengê wê sor e diare, qey hi-nekan te xapandiye heyran.

- Weh, de here lo, bi tirba bavê min ev ker e, ma tê min bixapînî; ma qey ez çêlekan nas-nakim ? De ji te re kera te û ka-perê min, de bi xatirê te !

Da rê û çû.

- Yahewlûwela, ev ker bûye, xwedê ev şaş kiriye. Çawa ji çê-lekan re ker dibêjin kuro !



ÇEPEAST

1- Şaireki Kurd e, Mahlasa wi Rûhi ye, dî sala 1850' an de li hêla Diyarbekir, li ali Çınarê li gundê Aqtepê hatiye dinê. Dî sala 1905' an de dî meha Sibatê de li Diyarbekirê mirîye. Cenazê wi li serdestan ji Diyarbekir heta gundê wi bî meşê birne. Eserên wi:

- a) Rewdet - ûl Naim
- b) Diwan
- c) Manzûma wi

Jî helbestêni wi beytek:

*Ji van qesdê min nine erz û huner
Welida li dinya biminit eser
Ku Türk û Ecem qet nebênen carekê
Nehin Kurd - i şar di mûraekê
Bîzannîn ku şar ji Kurdan hene
Jî uşşaqa Türk û Ecem zêde ne.*

2- Ne tiji (berepaş). - Gava ku nan û penêr an toraqê li hev di-

pêçe û dixwe, jê re tê gotin. - Ce-
fa, rînc. - Gava ku kevir dişkê ji
perça ki wê re tê gotin, perçen
ku tûj bin, li hin deran "qil" ji dî-
bêjin.

3- Dî alfaba kurdi de xwendîna
tipeki bê deng. - wext, gav, ze-
man. - Xwendîna tipeki bê deng.
- Noteyek, bî dimili ji dî maneya
ta de ye. - Heyat. - Lî Mîsira kevn
ji xwedayê rojê re digotin.

4- Aletek muzikê. - Ber, berhem,
kêr, tiştên kêrhati. - Nivê peyva
zaza (berepaş). - Destpê ka şevê. -
Xwendîna tipeki bê deng (bere-
paş).

5- Din, mezheb. - Du herfêni bê
deng ku bî erebi Nûn û Şîn dibê-
jin. - Bî sorani Hêvi, ümid. - Dî
fizikê de qanûnek.

6- Bî tevayı, genel. - Dî zimanê
awrûpayî de cêş, ordi. - Erê. - Dî
kurdi de daçekek. - Jan, ta, tajan.
- Bî erebi xwendîna tipeki.

7 Koka perpitandinê an perpitin
ê. - Mele, serekê mizgeftê. - herq,
qenal. - Devê nîr. - Wec.

8- Nidayek. - Tewirek giya, ne-
bat. - Xwendîna tipeki. - Cejn, ro-
şan.

9- Bernav (zamir) ê işarkî yê pî-
sê. - Bî erebi pirejimara şiiyan. -
Dî kurdi de xwendîna tipeki. -
Şaireki kurd; dî nabena 1904 û
1962 yan de jiye. Dî helbestek
xwe de weha dibê.

*Ey qîzerd, ey bejn û bala keleget
Bo kîz rawestawi beranberi min ?
Bo destit nawete jîr çeney xefet,
Le astî dimeni derbederiy min ? (...)*

10- Bî zaravê sorani "bêje, bibê-
je"


11- Heywanek ji dewaran. - Kafi.
- Ode, menzel, xurfe (berepaş). -
Dengek xuzayı.

12- Aletek muzikê; enstûrmanek.
- Bî kevanê tê avê tin. - Stri. - Dî
kurdi de pêre pozisyonek.

13- Dî kurdi de hin herem ji bo
Adem bî kartinin. - Kur, pis, role.
- Şair û niviskareki kurd i bî nav
û deng; dî sala 1903 yan de hati-
ye dimê, hina ji diji. Heta niha 7
diwanêni wi çap bûne. Jî helbes-
tek wi çarinek.

*Vê dûriyê ez din kirîm, eman ji destê
dûriyê
Bê xwendin û bê din kirîm, eman ji
destê dûriyê
Dûri ji pêta agiri, dîl girtiye qet namri
Her dem ji ber nal û giri, eman ji destê
dûriyê*

14- Lawirek (berepaş). - Lebat,
endam. - Xwendîna tipeki (bere-
paş). - Heri, turabxak.



15- Berxan karikên dî wextê de nebin ango dî wexta xwe de neyên zain jêre tê gotin. - Bajarek Kurdistanê navê wêne kevn yê nuh Urfa. - Cot, nefer, neyek.

SEREJÊR

- 1- Kincen kurdan yê milli ê mérän. - Ava gula.
- 2- Bî sorani "dibêje" (berepaş). - Bajarek Kurdistana Iranê, Kome-ra Kurdistanê yekem car h wê damezrabû. - Lî hinek hereman ji bo hemû, gişk de tê bî kar anin.
- 3- Nidayek, nolinek (berepaş).
- 4- Şairek ji Kurdistana Iraqê, dî helbestek xwe de ji bo zarokan weha dibêje:

'Serkewtin'

*Serdekewin
Çünke diwênenê,
Tope qurêki deskurdim
Daye dest minaleki Kurd
Ew lebatî bûkesûse
Twengêki biçkolaney lê dirûst kurd"-*

Rûn, bez.

- 5- Lî Kurdistana Turkiye eşirek.
- 6- Niviskareki Kurd ji Kurdistana Iraqê; hinek kurteçirok nivisiye, ev nivisên wi ji bî pirani dî kovara Gelawêj de çap bûne. Dî pê re, çirokêن xwe hemi bî navê KWÊREWERİ dî kitabekê de çap kiriye. Disa bî navê Jani Gel ji romanek nivisiye; sala 1972 yan de, romana wi 250 rûpele.
- 7- Bî dimili tu (berepaş). - Lawrek ji beşê pez. - Xwendina tipeki bê deng (berepaş). - Heri, turab
- 8- Şairek ji Kurdistana Turkiyê kîtabek wi binavê Lî Bandeva Spêde çap bûye, bêi wê ji hette nuka ji gelek helbestêñ wi dî kovaran de çap bûne. Helbestek wi çarinek.

Jindari

*Lî kersaxa evina te,
Dil masiyek parpitandi.
Bê derya evinê kî dit,
Jindariyê kî hêçandi ?*

Kurte nivisandina Hollandayê (berepaş).

- 9- Niviskareki Kurd ji Sovyet, romanek wi yi bî nav û deng heye ku navê wi Şivanê Kurd e. Romana wi hatiye wergerandin bo

pir zumanan, bêyi vê romanê ese-rek wi yi din ji heye. Kurdêñ Qefqasiyê û Derwêşen Kurd e. - Demek fiila dainê

- 10- Amade, hazır, kesê ku xwe pê şkêş dike.

11- Şaireki Kurda i bî nav u deng e, û disa ji şairêñ ewli yan yek e. Dî navêna sedsala 14 û 15 yan de ji ye. Lê him kes ji dibêjin dî sed-sala 11 û 12 yan de ji ye, esera wi ya bî nav û deng ji Diwana wi ye. Helbestek wi:

*Vê firqetê pur dil şewand
Cerhêñ qedim disa kewand
Şîşen di sor tê da tewand
Feryad ji destê firqetê.*

.....

Lî hinek ciyan ji bo dûmanê tê gotin.

- 12- Jî bo dimiliya tê bî karanin (berepaş). - Peyv, gotin, bêje (berepaş).

13- Pırsa neyiniyê, dijê "erê" ye. - Namûs, iffet, şermi. - Cinawir, ziya, ezzîha.

14- Kovareke Kurdî; edebî û kulturi bû, li Iraqê derdiket sala 1939 an de. Jî ali İbrahim Ahmed û Alaaddin Secadi ve derdiket. 116 hejmarêñ wi derket, mehê care derdiket. Piraniya niviskarêñ Kurd dî vê kovarê de nivisine.

- 15- Ciye bî av, dereke bî av (berepaş). - Navê bajarê Diyarbekrê (berepaş).

16- Zimanzaneki Kurd ji Sovyet, sala 1911 an de li hêla Qersê li gundê Sûsizê hatiye dinê, hina ji diji, li Sovyet dimine. Çend ese-reñ wi:

a) Gramatika zumanê kurdi (1957).

b) Zimanê kurdi (1961)

c) Gramatika zimanê kurdi, Qinyatêñ Kurmanci û Sorani

d) Rêziman

e) Ferhenga Kurdi - Rûsi

17- Lî Kurdistana Iraqê bajarek (berepaş).

18- Mirov pê porê xwe şeh dike (berepaş). - Bihî keti, na paqî (berepaş). - Dî kurdi de difton-gek (berepaş).


19- Niviskareki Kurd; romanek tarixi nivisiye, navê romana wi Mahmûd Axayê Şîwekel, Bêyi wê binavê Duwanzde Suwarey Meriwan kitabek din nivisiye. Romanek ji bî navê Kemançê jen ji turki wergerandi ye kurdi. Navê wi yê rastin Tewfiq e, dî 1867' an de li Silê maniyê hatiye dinê, 1909' an de bûye Qeymeqamê Hekkariyê, 1950' an de li Silê maniyê miriyê. - Kêzi, gêsû.


20- Şaireki Kurd, li heremê soran (Baban) dî nabêna 1797 û 1855' an de jiye. Şaireki xwenda û zana bûye. Dî dawya jiyana xwe de çûye Istenbolê, li cem Sultan Evdilmecit maye. Diwanek wi bî Kurdi heye. Beytek wi:

*Nemirdim min eger em care bê to,
Neçüm, şert bê, heta em xware bê to*

Ecele, bî lez. - Şaireki Kurd, 1921' an de li Kurdistana Iranê bûye, hina ji diji, şîira wi ya bî nav û deng Naley Cudayı ye. Beytek wi:

*Derdî dûri derdi dûri kuştumi
Derdî wusyari sebfûri kuştumi,
Yadi yaran û wilatim roj û şew,
Lê heram kurdum qerar û xurd û xew.*





BERBANG
TUNNELGATAN 14, 3 tr
111 37 STOCKHOLM

Ater

Okänd på angiven adress.
 OK. Adressen otillståndig.
 Avflyttad. Nuvarande adress okänd.
Distrikt... Signatur...
Skrivare

MASSKORSBAND

HUSEYIN SAHIN
3 Tvärgatan. 11-A
802 34 GÄVLE

ری خەباتمان چەندە سەخت و دوور بى
با چواردەورمان كىلىپەي ئاگىرىنى
لەم رى پىرۇزە هەرگىز لانا دەين
ئىمەين بۆ مردىنىش ئاما دەين

RÊY XEBATMAN ÇENDE SEXT Û DÛR BÊ
BA ÇIWAR DEWRMAN KILPEY AGIR BÊ
LEM RÊ PIROZE HERGİZ LANADEYN
ÊMEYN BO MIRDINİŞ AMADEYN

